


BİLGE ACAR

Xortê min ji yek ji wan



LAWİN




Ji bo
brayê hêja
Kendal ra!
18 Tirmeh 1994
Zarand


Bilge ACAR



Xortê min ji yek ji wan



Ev
nvisar,
je xwuska minTalie, û
je hemû dayikên dil
berindar an ra..



PÊŞGOTIN

ÇIMA EW KITÊB?

Xwendevanên delal!

Ez ji zanîm ku, ez ne dayika pêşin im, ne ji ewa dawîn ku eşa ewladê xwe ditiye.. Zanîm ku her roj, (xasîma lî Kurdîstana me) bî sedan dayik, derdê zarûyên xwe dibînîn. Dîxwazî biçûk bîn, mezîn; dîxwazî xort bîn, xama; dîxwazî bûk bîn, zava! Dîbînîn ku ew jî pêş çavên xwe wundabûn.. Û bî wundabûnek jî bînî..

Bî gotîna hêsan e, meriv ku dibê «wundabûn». Lê ew eşa ku lî pey xwe dihêlîn, em werin jî daykên wan bîpîrsîn! Xwe çawa ye, bra ew jî me ra bêjîn.. Ku karibîn?!..

Ez bî xwe bawer nakim, meriv karibe yek «dê» nişande ku lî ser zarûyê xwe yê çûyîn lawîna dananibe, nelûrîbe, û ne gotîbe! Ev ne mîmkun e, mîmkun nîne..

Pîr gotîna daykan lî ser evî derdî.. Ew xwe lî ser helîsîne gotîne; gotîna û xwe helîsîne.. Lê diyar e ku, ew jî bî pîrayî bî zargotîna!..

Daykên ku xwendîna-nîvsandîna nîzandûne xwe lî alîkî, lê mîxabîna yêna meyêna ku zanîbûne jî, ne gotîna em lawîjên xwe bîdîna hev, lî kêlekî bîhêlîn.. Ro hebe lazîm bibe!. De meriv kare bîbê lawîj, jî jinên me Kurdan ra lazîm nabîn? Xwezîl jî nebûnan!.

Gelî xwendevanan, nîzam bî we, me dayîkan tenê jî ber eşa dilê xwe şexsî bûye ku hewqas gotîna gelo?

Lê ew zarûyên me, ew xortên meyên ku pîr zû çûn jî destên me, wan gelo jî eşa xwe pêştir tîştêk dîna nehîştîna qe lî vê dîne, lî pey xwe?

Dayîkên ku bî xwe helandîna, wan lî ser wan çî gotîna? Ew bî hezarên lavînen ku jî bo wan hatîna danîne, pêçîbûna? Ew jî daykên

xwe ra ji xortên xwe emanet ninbûn qey? Ew çima ji wan ra xwey derneketî bûn?

Bî wan, û bî wan pîrsên hanên ku ji roja min ji, xortê xwe ê hêna bist û çar sali ji destê xwe revand, devê min ji, bî awê çavên min, xwe nese kinim.. Wê ji bêhemd got û got! Lê wê çî got, mî jê ra nivisand. Ji ber ku di nava hezarên kêmasiyên me jinên Kurdan da, ya xwe ji nedim serê, min xwest ew bêne weweşandin.. Bî niyeta xizmetek min, ji jinên me Kurda ra!

Dîl dixwaze, ev pirtûk ji dayikên me Kurdan ra bibe nîmûneyek, û ew ji yên xwe derxînin pêş çavan! Bê tîrs û bê iddia.. Xwe li pêş çav e ku ji meriv ra tê, meriv qe qelem negirtibe ji, ji wehca dilê xwe dikare belki roman derxe! Yên ku emrê xwe da helbest rast nekirine, (yek ji ez, eger ji yên min ra «helbest» bîn gotin!) dikarin ew ji bikin!


Ew bî navê «lawin» emma xwe baş, emma nebaş, hev ku ji destên me hatine, pewist e weşarti nemînin! Çanda gel ji bî wi awayi saz bûye.. Bî êş û kêfa dilê me insanan! Dî wê şorbê da piçek xwêda me jinên Kurdan ji hebe, ew ji baş e! Xwe dixwazi bî lawinên me bin ji!..

Lê beriya her tiştî, daxwaziya min ew e ku, dilên tu dayikan bî kula ewladên xwe neşewitî, li pey wan negrin, lawijan daneynî! Ew pirtûk di rengê xwe da, ya pêşin be, û ya paşin!..

Xwe bî dîl û can, spasê dikim ji havalên hêja **Senem-Ahmet Çamlîbel**, bî taybetî ji **Enstituya Kurdî li Parisê -Salih Yîlîk** û **Esin-Deniz Şimşekelê** ra, û dibêjîm hazîr kirîna vê kitêbê da alîkariya ku wan bî min ra kirîna tucarî jîbîr nakim!..


B. Acar
...09.1993- PARİS

*Ez ne şair, ez ne hozan,
ez ne xwediye ew dew, dozan,
Ez hemal im, barê xwe xem,
menzil ber bî dîl bî kulan!..*



Beşa Yekemin





ÇEMÊ HÊSIRAN

Nema feryad, nema girin,
hêstır hışkbûn, hatın bırrin..
Idi bı kijan avê bitemire
kezeba daykê de ku
hate pehtın... û kızıri?.

Hêstıro!,
hêstrê çavo!
Ax li mın bavo,
Av zûvakıra bû dûmano.
Şêmûza ku ne dıhate rayo,
orta havinê da zêdetır
dıbarande ji barano..

Rû sar bûy,
ax li mın bavo!
ji tışteki ninbûy hayo,
Germa Tebaxê da
davêtiy teyrokên
bı fêz û bı qapano!..

Ax bavo! li mın bavo!
Çı qevimi iro li te,
hışk zûwa yi bê imano?
Xwe hê li benda çı belayê,
dak û maka çı qedano?
Ku hay nini idi ji mın,
ji xortê mın,
ji derda, ji xemano..

Heylo ku mın digo,
Tu sarkıra tev agıran,
ji êşa dıla ra ji dewa yo!..

Bınêre!
Îro disa dilêm geşe-geşe e,
agir dı xûriyê da hıldayo.
Evê bı çı sar bıbe, bitemire,
xwe weşêri bı wi awayo?

Ku te ew gava mın teng da
hıs û pıs ji xwe bırand,
Dosti, hewaltiya te idi,
bo wext û demê me dınan
ne bı xêr, bı kêr nayo!

Çavo mın digo, *tu bı rehm i, tu bı iman i,*
tu ji wek mın dılbıxwûn i, bı dılbırin i.
Tu yê heya xweşi bım ra, derdê helgırini,
ne bı kel û hêrsa derewin, wê tu mın bıbilini!..

Lo çavo, tu disa jim ra hêsturkan bıbarini,
W'ezê bigrim, bibêm «Bavoo!»,
naxime xortê xwe navinê.
Xwedê zane, xwe ji dîl nayêm
ser AZADê xwe «lawo!» bikim biqêrinê,
Lê, zarinên min ku dıgıjin hêsturkan,
dîbın bulûr..bê pıfırın dılorinê..

Xwe me dıgot..
Kani hene.. çelpe-çelp in,
şırav, weki çeman..
Kani hene.. bı axin, xırin in;
bı derdê yeman!..
Kani hene.. dıkelıjin ji wehca,
ji agirê dılan;
Dıbın hêstır, av davêjin,
dıpijıkın ji cotê çavan..

Hêstro!

Ew kijan wext bû, ew kijan zeman,
ku te dîrûv dıdayi wan,
hê lezok bûy ji her siyan?
Lı ci-warê xwe nedsekiniy,
rû-ruçık dıdayi bın lesaran?

Ez ku, ji derdê
AZADê xwe ra dızariyam,
te ji bı min ra dıbarand,
mina van kaniyan dıhêsirand.
Ku me carek dest pê dıkir,
derge lı me nedıhat gırtın,
rê l' me vedkırtın bergeh û hêlan.

Ew çax,
dîlê daykê û cotê çav bûn
bı hevra dileyistın(!) ,
Nav wê avê da, bı hevra
dıkırın kêf û dilan(!)..

Mın hêstirkê çavo!
Were!.. disa were!
Qeydê kani were xwarê,
weki ewıl, weki berê!
Kulmê mın tijeke
nerme nerme, bere bere.
Ez pê bişom
ser û çavê AZAD ê xwe,
porên wi yê zere zere..
Evya bra bıbe şuştina derdan,
şuştına dayka wi ya
dılkeser e..

Lê hatina te ya evê carê
weki çiqılçem be, bı kêr nayê!
Gerek e bibi çemki giran,
bıghiji çend devê çayê,
bıkebı dewsa çem cobarê..

Çemê ku:
qêrınê xwe ra bıke pışti û barê..

Çemê ku:
pêlbavê, gurmin bıke bı hewarê...

Çemê ku:
bıçe-bê l'erdê, l'esman, lı xûbarê..

Ew wext 1di,

ji tera dibêm «Çemê Hêsrân»

Lî te dixim qîmet-itbarê,

xelas dikim ji halê sêwi,

êtimoka bîn diwarê..

De ku me dit

em hatine wê sinorê, lî wi qerax in,

Hewce nine ji xwe ra

lîvin, lîhêf, balgîv raxin.

Yek qûncîkek me ra bes bê,

bes pala xwe dabe rojhilatê,

Me bihesîbine lî welat in,

nav hêşinaya gul û bax in..

Emê bîkevin paşîla hevdû lî wê der,

helmêz bîbîn, berdîlê hevdû bîdîn.

Deri-derge lî xwe bigrîn,

xem nekîn lî kûder in.

Lî xan in, lî şîkeft,

lî qesr in, xwe lî qonax in..

Ezê ji te ra lî wê der

salîxê xortê xwe bîkîm, care çarîk,

rû bî rû.. bî pel bî pel..

Tu yê weri xwarda,

hêsturên xwe bîdî ser, bîbî çarîk

hûr bî hûr.. bî kel bî kel..

Û emê bî hev ra bêjin, û bînûrînin,

kûr bî kûr, bî pêl bî pêl.

Tu yê xwe bavêji ji ser dev û çarîk,

bîgrî dorber, tax û hêl.

Û ezê lî te binêrim û bigrim..
bigriim û bigriim..
bigriim û.. bîlorinim..
Dilê xwe helgirim, û w'ezê
bî ev şûr bikolinim..

Cotê perr lî te deynim,
ez ku xwe nehewinim,
Şehr -bajar bîfirinim,
behr, derya bîbhorinim..

Ber xwe da ji bêjim w'ezê:
Çemoo! gidi Çemê Hêsrân
tu çi di heriki bî hurini?
Dilê m hûr dibe, dihelize,
de meke ewqasi şirini!.
Ez dixwazim xemên mîn
kêm bîbîn, sıvık bîbîn,
Ev çi jan e, çi eman e
hê ser da ji tu pê dixini?.

Ma tu têt ji kîjan kaniyê?
tu ava kîjan qûleteyn î?
Ev çi xwûn e, çi xirab e
bî xwe ra ji radîkşini?

Ku te der-dora xwe fetisand
bî vê hilmê, bî vê bîhnê,
Tu yê çawa bîbî merhem, bîbî derman,
başbiki kîjan bîrinê?

Lê çemo baş diki-naki
ev awê te, tu dızani,
Lê karibi disa weri,
dernexi mane û mani.

Şêlû-mêlû ne derdê mın,
bes e qurçık neqelini,
Dev-zımanê mın zûwa neki,
mın ji tibûnê neteqini..

Hêstirê biêş!
lı te çiqas bıkım gazını,
Disa dızanım,
tu çavkani yi, tu avzem i.
Tu bılqe-bılqa bira kûr i,
lı ser AZADê mın dıbılqini.

Ev wext, wexta hatına te ye,
dıpeşkini, dıgûrmini.
Hema hema tije dıbi,
dengê te tê, dıhûrmini..

De vaye koxikên çavê mî
tasê sıfır in ji te ra.
Tiji diki, wan dıqefêli
bı kapaxên ser û bın va..
Bijang xwe ji dıkın alikari
dıdewsinın wan ser hev ra ...

Bı ûsûl û qaydê çemê cobar,
dıxûmxûmi, dıgûmgûmi,
derdıkevi ji çavan da.
Rê vediki l' ser cênik, hınar,
dadılıqi bı kınan va.

Navbeyna can û potan,
ber bı erdê va dîlezîni,
Ku şilkîri cotê piyan
xwe bazdîdî, xwe dibezîni..

Êdî dîbî çemkî nermîk,
çemkî zîrav-dîrêjî..
Mîna rûyê AZADÊ mîn tenîk,
bejna wîya zîrawîni.
De ku gîhîştî rîya rastî,
bîbêm-nebêm nasekîni..

Rêwî-rewan û dîlovan
hêdî hêdî xwe dîmeşîni.
Hati leqayê asteng û bendan
wan radîkî, hîldweşîni..
Dîbirri taqet-mecala wan,
bî awê xortîm av dîreşîni.

Dozek mîn jî heye veca,
tu lî ser rîya xwe dîbîni.
Ezê bîkîm hêvî, lava, reca,
wê lî te kîrm xwe bîlezîni..

Çemê Hêsrân!
rêwîti ne hêsan e,
herî, lê belkî nefetlî.
Lî pêş te çal û gêdûk,
hê gaz û gîr, kaş û gelî,
lî wan kebî tu yê bîêşî, bîbetlî.
Lê mîna ku dibên:
" Eger tev dûz bûya rûyê dinê,
xem lî kûder dîhat stîrbûnê?"

*Bêqûl û bexş, kendal û gaz bûya,
kulên xwe çawa dihatn weşartinê?.."*

Eger em zanûbîn:

pîştî tadayi heye reheti,
 lî pey tengiyê ye firehi..
Tari dibetile ber bî ronî,
 derge lî girinê dîgre kenî..
 Xerabî wûnda dibe bî qenci,
Xwe tev dijên hev, hemberên hev,
 nota başî û nebaşî.
Bikeys û zora xwe dijîn,
 bî hevra dîkîn gulaşî..

LÊ MİRİN?

Mırîna bêbext, mırîna bêwext ra
 çî hebe ser da bêjî?
Ku jê ra ninbe tu zîd- emsal,
 herî qûrnaz be, herî medrebaz..

Bîstine canê şîrinê te carî

 Idî nefetîne tu qêrînkî,
 tu zar kî, tu hewarkî.

Dîxwazî xwe lî rûyê dînê bîhêlî,
 dîxwazî xwe jê barkî..

Dîxwazîm çemo jî te hewqas

 em lî hev nekî nîz û nîyaz,

Tu were, jî bo ev dîlê bîkul,
 dîlê belengaz,

Xwe bîrê xe, metîrse

 jî xar û dîrri, fêl û fetbaz!.

Here bigije
ser kendal û gaz,
carna bibe hov,
carna bike naz.

Bıfire, lı ser
çiyayên tik û hevraz,
weki çivikê kûvi,
weki teyrê bewr,
weki teyrê baz..

Bimeşe, xwe bilezin çiçek!
bikebe nav deşt-zevian,
Sıtû xwar m lı wêder gul û çiçek,
lı hêviya Çemê Hêsrân..
Çemê ku ne lı pêş çav û navçek,
nay ditinê, nin be daxwaz..

Bı çiçekan kêf-şa bibe,
bı nermiya pûrta werdek,
bı nermiya pûrta qaz;
Bı hezkırına dilê daykan,
bı hezkırına dilên belengaz..

Bıçe tax-qerexê bax û bostan,
ne bı qêrin, xwe bı nerm awaz.
Bı ava xwe dilê wan geşke,
bajo toximê yar- hemraz..

Û here bihêjin baxçeyê gulistan,
çivik, çiçek lı wê der
bıhev ra bûne dil û can..

Lı wê der bı hev ra dıkin
muhebbet û naz..

Metirsin, wan meke
bın tora rûh û can!
Sıtriyên xwe te bêşinin, ne tışt e,
bes e ku bı te nekın henek,
bı çemê te nekın tınaz..

Bı dengki bılind gazike
dema tu hati nêzi wan,
Rêkûpêk ku nedabın xwe,
xwe nızanbın çı ye rêbaz.

*Ev çı qapan e, çı qûrebûn e gulistan?
çı ji xwe razibûn e, ev çı poz hıldan?
Ba radıbe, fidan xwe l'ber we xwardıkın,
hûn, xwe dihesibinin bûne «sûltan»..*

*Em dıbêjin,
Me ji dit mektep, dıbıstan,
me ji xwend çirok û destan.
Bıdın we ew navê du-sê tıştan
ku we qetandın ji halê diristan.*

*Xwe bes nine ewqas
em, xwe bı wê bıdın naskırın,
nayn ji welatê keristan?*

Çemo, ku te kır ev gazinên ha,
berê xwe bıde kulilkan.
Dı nav mêrga zer û hêşin,
lı ser çimen, çemenzar,
Bınevş, qerenfil, nesrin,
beybûn, nêrgiz û rhan,
Bêdeng in û feqırok,
bêhes in, xwe ra dengzar...

Pirsa wan ke, xeberde,
wan av bide tas bî tas!
Ew ji ji xwe ra dîgerin,
dost-hevalên xas bî xas..

Lê, dayka wan çemenzar e,
Çav li hêvya te mane,
ka dibine çi dibare?

Ku dibêji:

-Hey çemenzar, çemenzarê!
ez tîm ji dûr, ji berwarê.
Kelekel im, dikeljim,
ji çavên daykê tîme xwarê.

Hêviyam ev be çemenzarê,
lomê neki, neki arê!
Ez ji ali Xwedê da bî pişti me,
şermê li min neki barê..

Ew vexta ku Xwedê ji meriv ra ani,
me ra çi dibêj "MEM û Zin" da
tu guhê xwe bide Ahmedê Xani!

**«Can ku ji hepsa ten cûda bû,
feryad û figan ji şehre rabû.
Bû welwele û figan û zari,
bû zelzele, û bezin, hewari.»**

Dêmek ev ne mexsûsam tenê
bê xûlqi, bê samani,
Ew roj ku min barê xwe xas
ji mala min bû wê hilani.

Ew e ku ji ber derd-elema xwe
bêhemd e dîqarim, dîcanim ez ji,
Ew bra ney serê te gulizar,
bes li min neki lom û kubari.

Lê, ne xem im idi çimenzarê,
havin dabe pişt bîharê.

Zivistanê ku eva xwe kir,
guli qetand.. hişk kîr darê...

Hatime ba te bî zare-zarê,
bî halek ne baş, bî hewarê.

Xêra xwe gurzek **çim** bîde min,
dawiyê ra bîhêlin em bazarê..

Çemenzar çi dibê gelo?
lê binêr çemo, guh bîde!

Ava dîlan, Çemê Hesran!
Me çem ditne diarine,
me çem ditne dîbarine.
Çem heyî bî êş e, nexweş,
bişev-bîro dînaline..

Em çemenzar ne mali ne,
qırka berfê me dîhelsine.
Sing-berên me bî xwe tîji,
me li erda rût dîmelsine.

Lê, me ro ditnên, buhartine,
bêxwey, bêkesan sipartine.
Yek xwestûbîn hezar dane,
gul û peran neguhartine,

Çemo,
te ev bihist, ne ecıbini,
ber bı qerenfilê bılezini!
Yeşn e êdi xwe netirsini,
keska çemenzarê bıbir bini..

Qerenfila bı sımbêlê,
xwe lı dora xwe dihêlê.
Gerek tu jê ra vıha bêji,
çûy wê taxê, ewê hêlê!

*Hubra sorê qerenfilê,
bını tengê, dev vêlvêlê!
Eşq fırota, meşq stenda
bazırgana hûba dılê.*

*Jı te sitû dirêja sor-sonkê,
bı deqdeqên mor-monkê,
Yekfer dıwxazım, ne xwe cotek,
jı qerenfilên dor dorikê..*

Qerenfil wê serên xwe rakın,
bıbinın çem hati, nine baran.
Xwe lı ber te xwar û rastkın,
b'awê dıkın hemd û selam...

*Ava behran bı hezra sitıl û tasıkê
xılas dıbûn û dıqedıyan,
Rût û tût bû nıha dınya me nazıkê,
ketıbû şûna hışk devıyan.*

Xwe tu dıxwazi **sor** lı ber **keskê**,
lı gori dıla bıbe xûyan,
Hilde qerenfila bı bêr û heskê,
mekeve derdê kelle, mûyan!.

*Me metîrsîn bî loqa nîsqê,
mexe derdê xîzaniyan!*

Çemo te dit,
bê lavakîrîn, bê zariyan,
Qerenfil kîre dîl xweşiyân.
Nexwest jî te pûl û peran,
xwe jî doza te ra kîre boraq,
kîre beran...
Were, xwe hate dora nêrgîzê,
pê ra bîke pîse-pîsê!



*Lê nêrgîzê, xanîmqîzê,
lê narinê, lê mîzmîzê!
Rojek, du roj tu lî xwe yî,
roja çaran dîçîlmîsê.*

*Em ne ewên naz û nûzê,
lî me bîhuri wexta tîzê.
Qerenfil, çemen xwe l' benda te,
xwe lezke bî wan ra bîkeve rêzê!*

Kulilka pîzîk,
nêrgîza nazîk,
emel nake bî mîzdîk,
Çî dîbêjê jî dîl tê,
ne çalûsî ye, ne tîzîk:

*-Çemê şêlû, boze-bozê,
lî mîn dîxe qeyd û dozê,
Weki qewlê xort û keçan,
lî bîn darên hewr û gûzê..*

*Ez bîdîm te ev yek sozê,
wek kulilkên meh Newrozê.
Xwe dîkîm xeta wana sîpi,
dî nava **kesk û sor** da
nahewinîm meş û mozê..*

Çemo! bê kincê, bê mîdasê!
ji nêrgizê ra bîke sîpasê.

Lî gulizarê bînhêre,
lî dawiyê mayê, fizar e,
dîke fîrfazê..

Lî xwe dameyne,
halê te ra bûye şaşê.

Gotnên xwe bêje,
dîxwaze serê xwe lî kevîr xe,
dîxwaze lî nermê laşê.

Xwe tu bêje jê ra !

-*Ez ketîm nava dev-dîranê*
kula we gulizar,
Çerxa wê hestiyê hêrand,
bî rewşa destar..

Lî xwe, lî dora xwe binêrîm,
hê ji xwe ra ranebûm,
Lî ser xwe hîlweşiyam,
belav bûm, bûm par û par,
Awê bîn da rîzi bûbe
ew telisê xwe tîji ar...

Mî ra gotî: «Dermanê te
pîlora kulê!» gulizar!
Danî ber mî, rûn lê kirne,
nivî jî xem, nivî jî jahr!..

Ezê rûniştım lı ser,
ew bı têra dilê xwe xwar,
Jı dev û çav da ku avêtım,
jim ra gotın "çemê azar".
Lı ser vi sekıni idi herkes
jıbir kırn, bırn ra çı bû bazar?.

Ma lı te çı qewımı lê gulizar?
xwediyê gul i bı hezar hezar,
Seri hene, bı govde ne,
xebernadın, ninın bı zar?!

Gulizar dılgiri bû,
belê ku ev pırsa ha
ne lı gori wê bû..

Tê jı dır diyaran Çemê Hêsrın,
jı me dıke pırs û pırsın.
jı pırsgrêkan xwe daye ali,
ketiye dewa teq û reqan.

Nızane hoviti bû şûrê gelan,
huma rakırın, lisandın bûman.
Zordari ra gotın «yekitiya wetan»,
pê lı me xıstın, pelaxın,
Qûsandın nefesên me, qırkên me,
jı me bırrin deng û bengan.

Jı bela wan tırs û xofan,
mêrxwazi me rakır xwe dan.
Kêfa xwe weşart, nıxamt derdan,
bûn lalê bê his mayi,
nebûn xwe ra xwey û xwedan..

*Eva ye halê meyê bı dehr û salan,
bûye xwe dırri û sitiri
dixe lı çavên xwe dexesan.*

*Eger çemê me kesır i bı gulizarê,
Çend gotnên me jê ra hene,
lı darê bıxın wek hizarê.*

*Dertkêşa me ya gulizar,
jı kul û keser bûye bêzar.
Eleni-weşarti nema ku got,
dest da kêmbû şıvık jı dar.*

*Me kır şûna serok, berpırsiyar,
kır behsa mesûmên xwe, mezlûm,
zılmê gıranên xeddar.
Got, jı ber ew cefaya ku ditine,
jı zıman bûne, mane bê zar.*

*Em jı pê ra hatın heta vır,
em jı pê ra bûn dızar.
Lê, navê tewandinê tev nekır,
qe çıma qala wê nekır?*

*Lı ser çı ajotıbûn ew?
çı berhem jê hılanın,
çı nivisandin lı xana kar?*

*Ma qey çıma nızanın,
nebe hesab-hendese
qırdıkın lı merıv bazar?..*

*Qey hındık hatiye gotın,
çıma heyani niha dibêjin,
lı ser ev kula me xedar?*

Em werin!

*qêrin-nalinên xwe wek bîrûsk
bıkın desmala singê bîrindar!
Desmal aliki sıpi, ali dın çırûsk
jı xwûna sor.. jı ağır û nar!.*

*Bı gul û goncên xwe, zarûk,
bı egıd, xortên xwe, extiyar,
Bıxwazın jı dinyê heq, hıqûq,
hım dadgerê xwe bın em,
hım jı em jı dinyê gilikar!..*

*Dev -zımanên wan bıgrın em,
bıxwazın hesabên mal, milk,
canên xwe û ci û war,
Jı tewlê derxın em hespê xwe,
em lı hespê xwe bıbın sûwar..*

*Ku l' dinyê em tenê mane bındest,
bındestê milletên wer bêbav, barbar.*

*Ne bes e jı me ra gotın,
«Gulçin békêr ın, baxçê wan şorax;
ranabe tê da tu gul û dar?!»*

Werin!!

*Em vi navi ser xwe rakın gulizar,
ez ku tucar bım, tu jı bazar.
Em jı hevdû gul bıstının, gul bıfroşın,
ha xwe bı zar bın, ha ne bı zar..*

Çemo!

*xwe gotnên te baş bû,
dılê gulizara me aş bû.*

ji taxa gulan bihn dihat,
çiqas bibêji xwaş bû,
Te dest bî axaftinê kır,
qurfa te ne gaz û kaş bû:

*-Gulê, gulê, gula zerê!
kember lî pîşt, pûşî lî serê!
Rîndî û bihnê bişavkîra
xatûnoka heft dilberê.*

*Xwe kulilka bê hemberê,
av zêrina nav bêderê,
De binhêre lî vê qederê
dani ber me çî pêşgerê?*

*Mîn te xweşîka gula zerê
bijartime wek rêberê,
Kulilk-çiçek jî hev sehnakîn,
te bîkîm wergera me navberê.*

Heyloo!
çî bangîne
ku jî kulilkan tê?!
Çî gotîn jî çem ra,
gelo ka çî kîrîn pê?

*Em xwe bîbîn yek Çemê Hêsrân
dîkarîn bîpeyvîn, bîkîn peyvân
Dewa xwe nav hevda safîkîn,
em pax neynîn bî wergeran.*

*Xwe mebê dereng e dayka dîlan,
tu bî xêrhâtî, tu ser seran!
Bî erzûhal û bî daxwazîyan,
em xwe dîgerîyan lî beşdaran.*

Ne qar e ji me ra ku em bêjin,
xwediyê derd in bî embaran.
Kêf-şabûnê ji biro distinin,
giryên xwe difroşin em êvaran.

Xwaziya xwe meynin bî dar-beran,
ha lî çiya bin, ha l' berwaran!
Pûk û baran ku bîghijin hevdû,
me radikin ji şûn-waran.

Rût dîkin pelên me bî rûh, giyan,
davêjin binê piya, bin cenderan.
Xwûna me dîqetinin ji can;
dadîwêrinin şûşa û ferfûran..

Bihna me bî wi awayi
dikeve bin qedrê giran,
Ha kû lî devên me jî xistin
neqş û moran..

Bî kûrti bîbêjin,
şeperze ne em, perişan!
Rastiya me hûn dixwazin,
ev ikrama ser tepsîyan..

Pêçî lêxin, bî kevçî tamkin,
hesabê wê ku hat û nehat
bîdin serê çarêyê dînan..

Sîpasê dîkin em disa ji,
te lî birina me kîre lêdan.
Kulilk, çimênen me dixwazi,
em wan ji te ra dîkin qûrban.

Çemê çavan, çemo gidi!
bê lêv lertzandın, bê kelegiri,
tu bersiva xwe gerek bîdi, bêji;

*Gotinên we rast in bî tewayi,
ne xelet in, ninin waji.
Bawerkın lî ser kula me giran,
dîlên we çiqas diare,
diêşin yên me jî bî pîrayî.
Bo xwe cerbandinên mezinan in,
fîkrên xwediyên mêjî.*

*Ev kul, kula me, wê çawa safîbe,
heyani kuder wiha bîjî?
Ku xwe nehesibinî bîrayên hev,
bî hevra bîkî neyartî, dijayetî?*

*Nanê hîşk, xwuzyê da naçe,
ku bî av û dew nekelişî,
Zanî ku mîrî tê bî loqa ewî,
bî loqa zûwaya rîjî..*

*Ev êşa ha, wê bîhelîne dîlê te,
pîrtîr hê evê me jî..
Emê jî, heyani saxbî bînalî,
bî jana vê birînê, bî xwe tîna tirêjî..*

*De tu xêra xwe bîde mî,
yek hebek jî **gula zer**,
Ala xwe pê bîkme temam.
Wê lî ser xwe firekîm,
raxîm ala niştîman.*

*Derdên we, derdên xwe,
daynım ezê xwe lı ser,
Bıdım ber sıra êvarê,
xwe lêxım baê nalinan!..*

Çı aqıl dan mın û te çemo,
hate dengê kulilkan?

*Em kesk, sor, zerên xweşya dılan,
rengê xwe dane dar û beran.
Ketine dilên xort û keçan
lı ser singê ehlê Kurdan...*

*Çemê Hêsrın bıla nebê,
mın ji we xwest, lê we neda!
Kesk kulilkên sor û zer,
saz kırı **Ala Rengin**,
sefsef bûn, rûber hevda,*

*Bı ajneberi, bı sowebeli,
lı ser çemê hêsrın
wê pêl bıdın **Ala Kurda**.
Ew bı dılxweşi dıxwazın
doza te nemine nivê rê da..*

De waye çemo!

Ku:

Kulilk bûn hevalên te,
bı qayıl bûna dilê xwe va,

Ku:

bûn ala rengin, lı ser te
pêl bıdın,

Ku:

bı kêfa dilê xwe va;

bıçırısın lı ser te

bı revnek,

mırêsê xwe va;

Te çı xwestin dîmine ıdı,
ji mînneta Xwûda wê da?

Gerek e ıdı nesekını,
pêşi nedi balafıran!.

Heri!.. heri!..
Ber bı Perlaşezê heri!
Heta ku dîbini
qewet û taqet
te dı xwe da...

Xwe nêzi Perlaşezê bûy
dest ke, bı loriyê ke!

Xwe bêje:
Lori.. lori.. de lori..
Dayka mına dîlori..
Hatım mêvaniya te,
qebıstan i, tu çı gor i?

Ez têm ji diyarek heri dûr,
ji diyarê Tîlori,
Deri-rê lı mın weke,
bı kevım hûndır bê destûr..

Daykê lawikê xwe daye te,
dîbê çı çû gelo, çı buhri,
Canxweş be(!) ger lı ba te,
xwe jê bixım ezê dûr..

Ez sekınıya dora xwe,
xortêm rıya mın girt, bıhuri.
Mın hışt dı nava kul-endişe,
xıst lı devê xwe mor-mıhur.

De veke!
bêbextê deri veke!
 meke nazên xîlori!
Tu mîn rêber hesêbke
 ji ali dayka wi dîlgori.
Herm xorto bîbinîm,
 bîdîm dayka wi hîzûr(!)..

Daxwazke dîn ji bîdîm te,
 bêdest e, bêzar û zîman,
Şahedên nava mîn û te,
 ev ala rengin, ev esman.

Gel dibêjin:
Qebristan tunne, qasi te bûye bişan,
 Hewandiye nav xwe da, gelê bî navê giran .
Ewîl dînya derewîn, meqama navdaran be,
 Paşê tu dibî menzîla dawîya wan...

Heger... xwe nivîskarên mezin bîn...
 mezinê şair û wênevan,
Meriv, merovahi ra
 kirîbîn karê giran..

Ewên ku nawnetewiyê da
 cih girtine, xebitine,
Xwe şehîd bûne li xerbiyê,
 bî kul û hesreta wetan..

Berîya herkesê wan qebûl dîki,
 dibêjin... dora ewîl tu didî wan...

Dixwazim ji te :
jim ra vekî derî û sûran,
xwe bavêjim ser mezelan.
Hênîk bikim der û beran,
wan av bîdîm bî hêsrân..

Yek neqetînim xwe ji ewê dînan,
pîrsa wan kîm bî yeko-yekan.
Ew çîma bîn-tûta wan hîlanîyê
ji rûyê dinê feleka dêran.

Dengê Perlaşezê tê:
Tîştê dibê, ka li dilê te tê?

· Sîlav li te çemê hêsrân!
em ne ewên hukm, qîraran..
Der û dergên me vekîrî
li ber rehma we giyanan.

Xwe li ser evê pêşkeşî,
pêl dixî tu l' xwe çemo,
ber bî mezelan dîmeşî.
Derdê xwe ji wan ra dirêjî,
ew ji zanîn dilbîêşî i..

Mezelo, ha mezelo!
bî rêz in, bî intizamo!
Kêlik tûjîk, bîlînd in,
naçîn li qloçên xezalo.

Mezelo, ha mezelo!
bî rêz in, bî intizamo!
Ne şîvaq in, ne diwar,
ne li ser xwe zilano!..

Mezelon, ha mezelo!
bê isûl, bê intizamo,
Xwarin hezarên canên heyf,
mijin ji rûhan nızalo!..

Mezelon, ha mezelo!
bê isûl û nizamo,
Xort li dora we civiyan,
xwe li mal anin xızano..

Mezelo, ha mezelo!
bê cedvel, sazûmano,
Ava bû ev şehîr û bajar,
nav lê dan "Qebristano»..

Mezelo, ha mezelo!
bêcedvel, sazûmano,
We milkê xwe belakır,
li berêz, mêrxasano!..

Mezelo, ha mezelo!
bê hacet, malzemanano,
Danehev şox û lewend,
dixemlinin gorano!..

Mezelo, ha mezelo!
dîqûrûfinin fidano,
Xortên xwe bavan didin hev,
baxê xwe şêndikın bı wano..

Mezelo, ha mezelo!
dîrewinin xewano,
Dilên dayka hûr dîkın,
bı kul û kesr û kovano..

Ezê ji gihîştım vıra mo
barbûm bî ala gulano,
Tevi pîrsên dê-bavan
dîqewêrın dîlano.

Dibên;
Kanê qız û bûkên me yên delal,
kûr û xortên me yên çeleng,
pezên me bijarti, berxên beran?

Kanê gernas şêrên meyên şervan,
maqûlên me navdar, dengdan?
Kanê bejn ziravên meyên dalyan,
mêrxasi, hêjatya wana bî xemldan?

Kanê hêrsok, filintayên me,
fişek, wek ber devê tivingan?!..
Kanê me xwendevanên qelem dîgirtın,
peywên xwe bî giraniya zêran?

Kanê me şên-şepalên dîlovan,
xortên me xwe hindîk emsalên wan?..
Kanê? kanê? felek xayinê kanê?
ka te çîkır bî can, eşkalên wan?..

Fermana te ji rabe felekê!!..
Ka çî kîrın wan bî te,
te aniy encamên wan?

Xort bûn, keleşbûn, nîwal..
Hêna ter, korpe, cîwan..
Lî ber jiyana ter û teze,
hêna xwe ra bîdîtna
belki deeam û dewran..

Belê ku xwe ra bîditîna
dem û dewran?!..

Lê birasti, ev çîye ku dibên
"dewran û dem û dewran"?
çî ye eslê evi tiştan?

Birasti ye
lî gori hînekan,
dunya dûz e, fena sêni ye.
Disekine lî ser qloçê
ga-masiyan?.

Yan ji glover e..
digere lî dora xwe,
lî dora royê,
Roj çêdibin,
dîghijîn salan.

Xwe bê pê ye,
bê mîl e dunya,
kêfa xwe dîke,
lî fezayê...
lî asiman?!.

Çima,
bîni xwe tije kîriye
bî belangazên,
xwarîne pariya pêşin,
nedîtune ya dûhemîn,
ya sisiyan?

Çima, lî ser wê
heremzade
roj dîdîzîn ji rojê,
ji zêr-zîvan in
selebên seyên wan?

Lı kû ye ew ku dibên

"Edaleta Îlahi"?

Ku hinek heya girkê bijin,
gelek kûrt be emrê ehlê hêja,
bin axê da ji zû.. nızıyan?.

Yên ku,

Xwûda nasnakın,
xıstubın bin pê wijdan,
Bıxwûn heqên êtim,
feqir-fıqaran,

Qanûn dirêjkın ber me,
lı ser navê din-iman...
Lımêj-roji-ibadet
nin be.. xwe j' bo wan!..

Evha bû nizama

Zebûr-İncil; nizama
Tewratê, Qûr'an?

Çıma, hin hene

bêdest, bêpê, bêçav tên jıyanê.
bêsûc in, ninin xwediyê gûnan.

Çıma, hin hene

çarhev ji hebin ji wan,
Bıgrın ber dest-piyên xwe
qewraş, xızmetkar, xûlam?..

Tazi tên, birçi dıçın hin hene..

mıhtacên loq, yek qoteki nan,
Şir-mama sıparış dıkın
gel hene, ji dıyarên dereke,
Pê têrdıkın se-kûçikên xwe,
xwe j' dê-bavên xwe pırtır
qadr-qimetê didine wan!..

Çıma , aliki dinyê
b'avi, bî hebûn, baran,
Bı dengê def û zırne,
mırtıb û gewende,
bı rengê gesp û talan?

Çıma , xwe ali dın da
sıxreti, parskırın, nexweşın,
Şer û xwin, mırın-qırın
xelaya loqa nan?..

Ev ha ye nizama,
Tevrat, İncil, Zebûr?
nizama Qur'an?
Xwe l' ser vê bıngêhê ava bûbe,
lı ronyê xıstıbe wıha dûman?

Ev kijan qazi ye,
xwe kijan rayedar
daniye ferman,
Ewlad bın axê da,
bı niyeta bejna wan,
Dê-bav ziyaretkın
kevır hışkê mezelan?..

Aram nedan xwe mezêl,
bê saman, bê tebat in.
Paşıya gotinên te çemo,
xwe lı dilê wan nehatın:

Çemo gotın:
"Gazın bıke, dıxwazi
bıxe lı me gef û gûran.
Lê, lı me meke forma xazi,
me mek şûna rayedarın..

Bersiv hene emê bîdîn,
lê hîlnadîn neheqîyan..

Yek neheqîya xwe a mezin,
belav nebûya dî nav me da,
Me rast nedîkir wan kêlikan,
saz nedîkir wer mezelan..

Lê , tu meraqa me bîbexşîn,
em ji ji xwe ra ecêb in,
çî tîştên lî te qewîyan.
Ev pîrs da qîsûr mebin,
emê ji hevdû bîpîrsîn,
ev heq lî me teviyan!

Xwe çîma. bûyi evdal-gerok
lî pişt xwe parzûn, tûrik,
Jî kuçek dertêy, ya dîn dixî,
bî gavên kînik, tûlik?..

«Edalet» dîbêji û dîgerî,
dayî destê xwe mûmîk.
Hêl, rex û qerex dînhêrî,
nehîştî goşe, qûlik..

Cûre-cûre nîn ewan,
eger xwe ji me dîpîrsî,
Hînek bî tacê zêr û ziv,
hînek bêpere.. pûlik.

Lê, ya ku tu lê dîgerî,
ew "Edaletî İlahî"
Naghîje ser ax û herri,
nîne giyayê gûlik.

Dernayê ji çem û qılıç,
wenaxwi qûrte qûrtik.
Ne xwarin e, pêxwarin,
bîdi ser loq û zûlik..

Naçe-nay ew li dinya wiran,
teng jê ra, awê qûlik.
Çi ye, çisa ye kes nîzan,
gemçik pêva, ya dûlik?

Lê, hîn dibêjin ku:
Ev keçika çav girti,
terezi digre dest xwe da,
Xwezginiyên wê pîr bûn.
bî standin û frotan.



Xwedi, neçar-bêçar ma
ji ber ar-namûs-heya,
Wê xîst nav qada dunyê,
navê qadê kîr «dewran»..

Esman bû qapaxê ser,
dora xwe hat girêdan;
Wê radan bî mifteki zêr,
wiha ra gotin "jiyan"!..

Firt-qûrt nebû, ninbû loq,
nehat xwarin, wexwaran...

«Edaleta Îlahî, «Edaleta Însanî»
bî me hewa ye.. hewa!..
Ne ewa bî kêri pişik tê,
têda heye oksijan..

*Ev horiya por kejik,
ew ne ji bona rebenan,
Wê nabinin ez û te,
ew li min û te nexûyan!.*

*De haydê! oxira te bî xêr!
xortê te li hêvya te ma.
Megere li xêr û nexêr,
roj kî in, emir nema!.."*

Çemo!

*wê axaftina raste-rast
te kîr bêhal û bêtab,
Dîl û canê te êşand,
te da bî derbê kêran..
Mire-mîrek tu diki,
tu tişt dibêy ber xwe dan:*

Mezelon!

*Xatîr dixwazim ji we,
carkadîn bali we naym.
Hûn ji barê xwe li min kî,
li min rêwiya xeman...
Berê min bîdîn xortê min
bîbîm jê ra ew kulan.*

Çemo wiha dibêji,

*lê, gavek zedê navêji.
Xwe giran, perişan i,
mest i jî wehc û kerban.
Lî dora xwe dînhêri,
razanê dîgeri,
dîgeri dilki aram...*

Dengek tê ew gav gûhê te,
ji dûre-dûr, ji kûr da.
Der-dora xwe dînhêri,
dîgeri jor da, jêr da.
Çı zani çav bî zar bûne,
dîpeyivin bî te ran?

Dibên ku:

-Çemê me yê hêsrân,
rakır xweli, xûbaran,
Weki kani tu hati,
te em kırım perişan.

Bê xew in em, bê razan,
çende û çendik zaman.
Bihna xwe vedin em piçek,
barê xwe hıldim di şûdan.

Çemo,
çav lî hêvya te neman,
bersiv çî bû, te da wan.
Hatın serhev hêdika,
xwe bî bijangên xwe radan.

Serbori ji xwe rêzkırın,
çawa çav çûne serhev.
Xewn û rast lî hev ketın,
pêşi-paşi nedan hev.

Çemê kulano, çemo!
tu çûy kû, çî kır, te çî dit,
te çî dawşand, çî weşand,
Lî kêleka te, bî te ra
ez ji şahed.. mın ji dit.. ku..

XEWNE ROJA ÇEMÊ HÊSIRAN

Mala xortêm tuji bûye..
pê li dikeve, ji mêvan e.
Hinek li ser piya disekinin,
hinek ji wan çok vedane.
Deri vekiriye, li ser piştê,
tu dibêji.. dergeyê xan e!..

Yek rûniştiye li nav ortê,
wi nasdikim, tenbûrvan e.
Yê ku pê ra mijûl dibe,
belê ev ji bilûrvan e.
Ew ji hevdû qet naqetin,
biçne kûder bi hevra ne...

Bêhîs û bêdeng sekînine,
serên wan xwar, li ber wan e.
Govendvanên xwe ji li'aliki civyane,
pêşi dane pêşberane.
Ji bo dest bi kêfê bîkîn,
ew xwe li hêvya sazbandan e.

De vaye ew ji hatin, ketin hundir,
idi wexta govenda ne.
Wê bireqîsîn, naxwazîn tiştê muzir,
ew keç û xortên dawetan e.
Ew hazır, temaşkarên xwe hazır,
ev dem.. dema van xortan e...

Lê, bîbê çîma kes naleqe xwar û dûz,
ma dî bin giraniya çî da mane?
Çîma lî ser çokên xwe tev bûne xûz,
awê hesti ne bî wan ra ne?..

Ne deng walle, ne hîs û pîs jî kesîk,
awê xwe difroşin bî perane.
Lî kê dînhêrî mûr û mirûz e rûçîk,
qeydê kevîrê mermeran e.
Mî dîgo ewê rabîn govend daynîn,
ev halehal, jî bo wan e..

Herkes jî xwe,
jî canê xwe acîz in ku dit
Berê xwe da tev hazîran
rabû ser pê sermiyanek.

Bî dengê zor û gelek giran,
hîlda serê xeberdanek.
Cemaetê guhda, ka çî dî got
ev me kalê rû mîbarek?.

Got ku:
*Geli hewal, bîrayên delal,
ez rêwî me, hûn jî mêwan!
Ka em werin jî hevdu pîrskîn,
kê ku ditibe evha nişan?.*

*Xwe kî bikeve vî hundurî,
serî da rabe ku qêrîn, figan..
Pîrek lî dora hev şaş û gêjbîn,
lî ser hevdu per perîşan!..*

*Bı helwela şın be ku mal,
bı çı xweşkın emê dılan?
govend ranexın bûk dı nav da,
zava nexın binê mulan?.*

*Ne lı hev, û bê ser û şûn be ku mal,
lı hev keti awê gule, qırqışûnan.
Ku kılam û ken û şahi nebe tê da,
hêstirk bışon dest û rûyan!...*

*Serê herkes xwar e ber wan,
wek xwe gırtiyê kelepçan..
Û hewa hundûr me bîfetsın,
mina dıbare bombê Seddam,
lı jor me da, lı bajarê Helepçan..*

*Lı rûyê hev binêrın ez bıtersım,
ku ne mij e, ne xwe dû ye, ne dûman.
Lê, çavê xwe bı çavê kê bıkebım,
bıbinım şıl in, ew şêlû ne,ew xımam..
Çavê xwe zûwakın xort û keçık,
desmal, kesk û sor û zer bıın..
xwe lı ber dest û pêçıyan..*

*Ki bı mın ra tê, bıra rabe!
sekna vıra ne bı sebiran.
Em karkerên ciyê dûr in,
xwediyên zêç û, zarûkan.
Me ji xwe va, me go ku
emê herın, xwe şabıkın,
bı dengê nay û şalûran(!).*

Camêr rabû ser xwe derkeve,
xwest nivzareki xatiran.
Rakır solê, kire xwe pê,
xwe saqo dani ser mılan.
Lê, xortek kete berê, nehişt here,
ber lı wi girt bı destan.
Hilda çakêt ji ser mılan,
bı awê mezin, zanevan.
Destê wi girt, wi fetland,
pê ra kire peyivan.
Tıştê ku digot mın û wi ra,
rasti dani pêş çavan...

*-Lo lo kalo, go, lo kalano,
tu lı xwe mexe zıpıkan!
Bêtebatı xwe lı me nay,
lı me xûlqê sebiyan.
Bıke ber xwe piçık sebat,
bıbine tıştê qewıyan..*

*Rast e, belki hûn hatıbûn,
ser qewl-niyeta dawetan.
Xwe saz bend ji ew dixwestın,
rastkın kêfa cıvatan.*

*Lê derdê me ev,
xortê malê xwe iro çend e,
lı dora me nexûyan.
Mal û malbat lı xwe şaş in,
bav dıponıje xwe kûre kûr da,
gırtiy lı xwe dev-zıman.*

*Xwe xûşk -bıra ne lı xwe ne,
ew xwe çı dıkın ne beyan..*

*Hal-ehvalê lı me wıha kalo!
va te bihist bı guhan.
Tu keti etriya şayi û kêfê,
dereng ketın, lı kû man?*

*Xwe nızanbi eyni rê da têr-bırçi
ji hev çıma, çı sedemê qetiyan.
Çêtır ez û te xwe fembıkın,
sed sal emr, xwe ji me ra bı kêrnay..*

*Rabe ıdı ser rıya xwe!
bê lêxıstına def-elbanê,
Bese lı serê me megerine,
baê cırûf semûranê.*

*Gava ku kalo evan bihist,
sıvık rûnişt ser çongan.
Jı hev çû, weki kezyê nermê sıst,
nakevın ber dest û pêçıyan.
Reng nema lê, dev neleyist,
gotın nani ser zıman.
Hetani lı xwe hişê xwe hat,
cixare kışand bı baran.*

*Serê xwe rakır, gûhê xwe da,
dıhat dengê tızbiyan...
Ew bû, bı pêçıyanan dıleyist,
monik dabû bın derban.*

*Çokên xwe girt, bı hişk - şedit,
hêdi rabû ser piyan.
Nêzi xortê me hat û rûnişt,
mina lebat ne pê ran.*

Xwe şermok, lı pêş tevaya gişt,
lı xwe nehat bı deqıqan..

*-Lo lo, got: Lo lo xorto!
bınhêr lı mın çend caran!
Ez ne ew im ku te rastkır,
lı pêş çavên camêran.
Sıfatê ha lı mın nehat,
mın mek şûna zılmkaran.*

*Me dit heyat bı navê jıyan,
gişt şın û şahı bı hevran.
Kengê be me go emê bıçın,
nepivın kinê bı heyfan.
Hatın dınyê ku em bıjin,
hemınê carek dınê nayan.*

*Jı me ra gotın,
kêfek(!) heyı, bışan e, bınavdan e,
bihnê dayı mısık û ember, gul-rıhane..
Em jı herın, sıng-berê xwe pê tıjekın,
salıxbıdın(!) lı dost û heval, embazane..*

*Û me lı xwe kırın şal û şapık,
lı hev anın şalvarane,
Xwe ra hıldan desmal-laçık,
kesk û zerên xweşikane.*

*Ma çı zانبûn, em hatne ser da,
ew hêstır in bı peşk, bı peşk,
belav dıbın bı çengane?*

*Me dit behsa x we ye tê kîrnê,
lê xortê malê nexûyan!
Xortê zû kemîli, zû gihişt,
bû mîrazê dê-bawan.*

*Û lî herkesi xîsti derdîk,
ranabe serê kesi jî ber wan.
Awê lî ser kîtêba xwe bîponije
nîvisarek, torevan,
Keti heyriya lî hev deyne,
serborî û bûyeran.*

Kalo, gotîn dev da,
Ev dem, kete hîndûr yek hermetîk,
du hev keçîk bîn mîldan.
Yek cûn-cûnîk, gîwîn gewrîk,
ya dîn dirêjoka esmeran.
Yek lî alî rastê, lî bînê çengîk,
ya dîn, xwe birindara xençeran..

Hermet sîsteqokî bî zor rûnîşt,
rûçîk bî şopên fîzaran..
Birri kalo, dengê xwe kuşt,
berê xwe da dîlzarî.

Xwe ber wan hat paşê, xwe hat nêzîk,
nihêrt lî halê sîncê wan..
Ev xemnokên derdê bêbîn, bêberîk,
hay ne jî kalo bûn, nej' yê man.
Çav kûr çûne, rû lî xwe sîpi-sîpiçolîk,
mîçkandîne jî rûçîkên xwe xwûnan..

Netewti kalo, nedit sebrî dî xwe da,
da berê xwe mîn û wan.
Xwe hev da, pari pari xwe tevda,
xwe nîzanbû kûda lêxe xeberdan.
Lêkîr vêcar ku serê xwe hîlda,
serî vebû bî awê tayê glokan...

Serhev ani, xwe dev lerîzi,
xeberda me ra bî dîzi dîzi..

*Xwe şermiyê pêş we xwûşkê,
lî ber mêvanên delal.
Bîbexşînin mîn ne l' xwe yê,
mîn extiyarê pirê kal.*

*Dîbêm, bî şewata dilên xwe,
hûn çiqas bîkî nala-nal,
Felek kîrîna xwe domdike
ha jî kê ra şîrî hat,
ha jî kê ra tuj û tal!.*

*Dunyê jî wexta ava bû,
jî agir-xelî, kaş û çal,
Hê jî kesî ra nebû war,
xwe jî kesî ra nake mal.*

*Xortê te dûr çûye dibêjin,
ne jê xeber, ne jê qal.
Hê sê-çar rojên kî û qot,
neghiştîye meh û sal.*

*Ez ji dayikê ra dibêjim,
Herim li hev xim kaş, hevraz,
qoleçankim berwar, pal,
Terif û şıklê wi bîdi min,
ez li xortê te bigerim,
belki derxim bejin-bal..*

Dayê, - ew ez -
bersiv da ji kalo ra,
awê xwe bispêre ji bavo ra :

*"Omûd xwarina jiyan,
emê ji têxin ber dîlan.
Va te soz da, te qewl dani
bigeri xortê m ji me ran..
Ez ji li ser xwe hildidim,
xwe karê wi salixdan .."*

Xwe nizam yek, dudo.. ya ji penc ro,
çend roj bihûri di nav dan?
Gotin: xeber heye ji kalo,
şandi xwediyê mal ra qasidan..

Bî umîd û bî hêvi,
minê guh da xeberan.
Ku hîna got zava hatiye ditin,
hîna got, nine eslê wi tiştan.

*"Dîkîn-nakîn zava nay,
xwe weşarti ji gelan,
Fedoki, şermoki ye,
ranake dawet(!) ji nû dan...*

Gerek, mêvan-dewatvan,
mezın-pıçûk, xwûşk-bıran,
Tev bı hev ra herine bal,
lı cem wi daynın dilan(!).."
vıha dıgotın hınekan.

Malbatê dani civinek.
tevi gıre-gıranan.
Soz û qırar kırın yek,
belê ew, bıçine ba wan.

Bû dı malê da teşqele,
çûyin-hatın dı hev da...
Kes ji kesı nedpırsı,
kê çı l' hev xıstı, çı tevdá..

Û ehlê dawetê(!) rabûn,
xwe bıçın kêfê(!), teranê(!),
Gênc-piremêr tevi hev,
hevra bıkın seyranê(!)..

Çemo!...Çemo!...
Mın xortê xwe lı wê dit ,
hındûrê sendokek da..
Der-dora wi pêt kırı,
ser gırtıbûn bı camê..

Serçavê xweşık, lı hew,
lı pêş mın bû, lı meydanê,
Wezelandi lı ser pıştê,
nedınhêrt vır da, wê da...

Waqtîr.. maqûl.. efendi..
bêhayê kul û derda...

Çavên xezali girti,
bı şeklê hiva hilali.
Her perçemên pori wi,
ji rengê birû û bijanga...

Pozê xwe zravoki, pijdan
lı ser lêva jorinê,
Ri-simbêl dûzan kırı,
teze avetiyê dı bın da...

Xwe yekhev zıpkên xwûydanê
lı mın xûya nav birûyan da...

Devê xwe nermık qefalti,
tu qûsûr nın bû tê da.
Ne tûj, ne glower çena wi,
xwe çixêz kırıya desta,

Yekcarna dışkand xwe çavê rast,
wek.. tişteq bıgotı ji minê rallı.

Cılên serê zer û kesk,
heyani navık xûyanê.
Xemulı pê ling û dest,
çiçek sor bûn lı dor da...

Xort.. şıkıl-şemalê xwe dı ci da,
dıgotı, va rabe ser pê û linga...

Asêbûm bî sendokê va,
vekım, xortê xwe jê derinım,
Daweta ha(!) eva wi, ew ji zava(!),
nedibû bımıne dı xew da...

Rabe ser xwe, guh bide!
bıbhize tê dengê çi def û zırna(!).

* * * *

Lı kêleka xortêm dılberk,
xûya dıkır ji dûr da.
Qefalti serçav û serık,
veşartiya bın perda...

Xwe nêzi wê bûm pıçık,
ji mın ra xerib nehat.
Ew bî xortê mı ra radibû,
xortêm ra dıçû, dıhat..

Naskırya mın ew dılberê,
herkes nişani hev dıda..
Bı nêrtına çav-nezerê,
mına stêrk şewq dıda..

Dor lê gırti bı çemberê,
nıkarbû seri hılbıda.
Lı ber çavên dost-hemberê,
carna nêzi me dibû,
carna xwe ji me dûr dıda..

Dixwestim biçim berê,
rû-rûçik bîditma..
Gulavkîm dor û berê,
bî ava gulan bin bîda!..

Lê, dorbera wê girti,
kes rê lî mîn nedîda.
Sîtûyem lî ber xwarkîrî,
lê nihêrtim jî dûr da..

* * * *

Bûka mîn.. xwe bejîm dirêj,
par-perçe fistanê wê,
Ser û çavê wê tev girti,
bî reng-renga xêliya wê.

Weki nav lepên hînkî da,
bî sere xwe, mîl û pê.
Ew temam jê ra xerib,
ew temam neyarên wê..

Bûk wîha nedit kesi,
herkes bîqşîne ber xwe.
Serê wê yê bî xêli,
bîqetînin jî weslên wê...

Kes nîzanbû, xwe çî bûn ew,
meriv bûn, yaban bûn ew,
ya jî howên çiyayî?
Nedhiştin bûk bîghije,
xweyê xwe, azadya xwe..

Rebenê bavêta gaveki,
dığirtın mıl, enişkên wê.
Serê xwe rakıra qaseki,
dixıstın bın derbên pıştê..

Lê xwedi bı rık, bı kel, bı inad,
bûkê dıkşande ber xwe.
Seri-gowde ber me hat,
weslê dın jı wê cihê,
qet weki ne malên wê...

**Wê lı me dınhêrt.. me lı wê,
em şermiyên halên wê!..**

* * * *

• Oda(!) xortêm bıçûk bû..
ancax lı gori du kesan...
Eger.. pır nêzi hev bın,
baş hemêzbın bı hevran(!)..

Deri lı wan vekırı..
lı benda bûk û zava(!),
Me **AZAD**ê xwe kırê,
sılav danê bı bêran(!)...

Destki bûkê mın ra,
ya dın dı destê bav da,
Me wê kır paşla xorto,
deri lı ser wan radan...

Kûlilk-çiçek bî pê bûn,
xwe avêtine ser wan,
Dorhêl mîsêva girtin,
qûl û mûl nema bê wan...

ÊDi kêf, kêfa bûk û zava(!),
bî hevra, bitenê man.
Êdi wê qala xweşi, geşi kîn,
ew, ewên heqê xwe ken,
ew, ewên xwe tiqe-tiqan(!)..

Gerek mêvan, dawetvan,
bî serê xwe bihêlin wan.
Nema şixûlên xwe bî kesi,
dixwazi dê û bav bîn,
dixwazi.. ronya çavan...

Lê.. ev çi ye? ew ji ki ne ?
xwe çi axaftin e dirêjin?..

Lî ser kijan zava gotine,
çi ra lî ser AZADê m dibêjin?
Ku...ji bona evina dilê xwe:

AZAD.. kîre vîha.. wîha... ewha ye...

AZAD.. çûye vîra... wîra... ewra ye...

AZAD.. diti evya... ewi... ewya ye...

bî kurti bîbêjin em dibên,

**AZAD.. lî ser destgirtiya xwe
can dikire fida ye...**

Ma qey fehmkori bûme, çi bûme?
gelo min aqil çelqiland?
Ya ku ev îşê fem, ferasetê ye,
Xwedê ne l' min peşkiland?

Çıma bû xwe gelo gidi,
lî ser xortêm ter û can
weki dikirî telqinan!..
Çıma bû ew jî çavê dihat,
ev lehiya ha, ev baran?!..

û, ew jî ki bû ber mî da
dubhuri vîha dîgo?
Ew ez bî xwe bûm gelo,
ya ew dayka dîna bû?

*"Ev dilan serrast bûya
perr û bask hevraz bûya!
Ber bî xwedê radîbû
dengê kêf-niyaz bûya!..*

*Ev davet rasti bûya
şin-giri qesti bûya!
Dayê nedîgirt xwe l' ser pê,
jî govend westi bûya!.*

*Daykê jê bêri bûya,
lî dinyek dûri bûya,
Ev halê xortê xwe nedîta
lî gorek mîri bûya!.*

* * * *

Nîzanîm!..
çend daqîqe derbaz bû?
çend deem bîhori dî navdan?
Mêvan, dawetvan belav dibûn,
kêf nînbû.. bî mîn.. bî wan..

Nızanım,
sersem bûm, gêjik bûbûm,
ez evdal mina dilan,
Lı çı nihêrtım ne ditım,
bı çavbûm, merûma ronya wan...
Bêmıl bûm, bêçok bûm ez,
radıbûm û diketım,
diketım û radıbûm.
Halê mırışka bê seri
hıldıpetikim dı ci dan...

Çı hebûm jı bira mın çû,
navê bûka mın tê da..
Dı wê welwelayê da
ne jı xwe hay bûm, ne jı can..

Xortek ber bı mın dıhat
dırûv nedıda nasan.
Dost, xerıb-dost xûya nekır,
hat jim ra belki wûsan.

Wi fetılandım ber bı xwe
bı halek xıroş, perişan.
Pırsa dilê xwe jê kırım,
bı tawrek tırsok, dılovan...

-Şıka bıbê delalo,
navê bûkam çı bû can?
Ez gêjika kêma aqıl,
bira xwe da naminım,
jıbir dıkım zû tıştan.

Ev pîrs da çî hebû nîzam,
çî bû tê da xelet, şaş?
Camêr lî mîn nihêrt, lî halê mîn,
awîr da mîn nebûn baş.

Destê xwe dirêjkîr ber bî mîn
wekî bikeve gulaş,
Lêkîr ku devê xwe vekîr
barand dî mîn da xweli-taş...

Mî jî ber xwe da xwe ra go :
ne ez bîm, ne navê mîn be,
ku bûme hewqasi şaş!..
Heq e biteqsim ez jî vir,
qe nefetlîm lî pêş û paş!..

Dengê wi dihat ku got:

*" E ra tu xwe lî nîzani datîni,
ya têy jî mala dinan?
Te sal, demsal derbas nekîr,
te dunya nedit, nebinan?*

*Jî bo Jîbir kîrîm bîbêjî,
ev navê bî kul û bî derd,
bî heskîrîm, evîni,
Ya lî hev dîxi rasti-şaş î,
ya xwe bî rasti gêj î.*

*Erkena xwe tu çawa dibîni,
piştî xwe rast sekîni?
Eger nebêjî ev şerm e,
wê lî xwe fedî nebîni?*



Eger nızanbi rûmeta te,
wê daye ser sing û milan?
Eger nızanbi tu Kurd î,
têy ji axa Kurdistan?

Dunya, çiroka me bîhist,
ew ji xeyni te bitenê
bê çûndina dibistan.
Navê bûka xwe dîpîrsî,
Kurdistan e rebenê!
Kurdistan e, Kurdistan!..

Jî bo eviya bızanbi,
ne hewceyê zanistan!
Evê kîlamê gel dibê,
guhê xwe bîde helbestan!..

"Kurdistanê rûh û can
bî pênc zarav û, pênc lisan,
Te got, gıriyay jî me ra,
me dîl, gurçîk helîsand!.

Tu bî me horî, hîm melek,
dîlbera welat dîlistan!
Hîm jî kul î, hîm jî derd,
rehme lî ezabê qebîstan...

Zava-xezûr ketin hev,
nav bav-ewlad da bû nîfak,
Gava liber wan çûy-hatî,
naskırin te rûyê pak..
Ew dudo bûn bengînên te,
dudoy dîn mecnûn, derdnak!.."

Aax! aax! te xençer kîr dilê mîn,
Kurdistanê bûka mîn.
Nehîştî xwe kîlama te bîqede
tu ezîza lawê mîn.

Dema ku mîn navê te bîhist,
şewatek li canê mîn xîst!
Weki birûsk hat, xwe lêda,
xwe ji mêjîyê mî da derxîst!
Ez kîrîm agirê sotîk,
bû alav dûman daxîst.

Serê xwe bilînd kîrîm,
ew xwe ji camêri bîpîrsîm,
Lî mîn mîriya ser lînga,
ev çî agir bû pêxîst?

Lê, weki cînê nava nal-bîzmar,
tunebû kes li dora mîn,
Xwe mabûm di nava çîvîkên dilbaz,
xwe ra dîkîrîm pîste-pîst!
Ew ji şaş ji halê mîn ra,
lî ser gûliyên gûr û sîst..

AZADo aax, aax, lê mîn ew gav,
mîn ew gav aax , gazi te kîr,
mîn ji te îmdadê xwest.
Mî xwest agirê canê mî bubhêri,
lê bîdi navber-rawest.

Lê heywax lao, lo li mînê!!
ku ji te ra qe nebû xem,
tu li hewariyam nehati,
Weki gurê har, bêben û bêgem,
xwe bî kezeba xwe ketîm.

Ne gotim lı seri, lı bın,
lı çep û rastê binêrim.
Ne gotim wê ji qeza-bela,
jı agirê dın bispêrim.

Wê danim ber dev û dıran
çawa lêhat gezkırım.
Her çiqas kûrıda çû,
her ewqas kûrda bırım.

Lı mın ew çax,
ew çı deng bû jê dıhat
xwe ji kûriya dilê mın,
bı mın ra qezi dıkr?
Nızam şıret bûn ew, nesihat,
çı xêrxwazi bû dıkr?
Hesabê rûh û can bû, çı bû,
çı bazar bû ku dıkr?

Dıda ber destê m dûzanık,
yan ji belki meqesık,
kûr bıkm por û gıjk.
Dıxwest xwe bavêjimêkê,
rastkır lı ber mın behrık,
Sebr û sebata xwe tunnebû,
mın ji para tan dıkr..

Dıxwest xwe rakım, helinım,
çare-ilac ev dıkr.
Çı mabûm bı navê mêji,
bı ev fıkr nıkıl dıkr.

Xwe bişev-bıro bı mın ra,
ecız bûm, tecız dıkır,
Qertê mırınê desta da,
canê mın hecız dıkır.

AZADo! berxo lao, berano!
dengê ha çı kır û nekir,
mın bı awê dilê wê nekir.
Lê ez rabûm û rûniştım,
ew bûm bı te ra xeberdam,
bı te ra mın qale-qalkır.

Te lêva jorinê nani,
lı lêva jêrinê nexıst,
Wûşeki nedayi serê,
lê zêde nekir.. kêm nekir..

Jı kulê, kerbê, teqiyam,
heliyam weki şekır;
Alav-alav şewıtım,
tasek av.. te lı mın nekir..

Xwe bındest kırım herduyan,
herdu çavên xwe hêsir,
Bı wan giriyam.. pır giriyam lao!
ku lı te qet tesir nekir. .

Hêstirên ku wan barand
bûn çemê Diyarbekır,
Çemê bı axın û zarın,
xêr nedit, sefa nekir.

Lê nızam

Ava wan hındık hat,
ya tina wan têr nekır,
Te dev, lebatê xwe neleqand,
te lê qedr, qımet nekır!..

"AZADê m

zizok e" xwe ra gotım,
belki te l' mın eks dıkır.
Rabım dilê te xweş kım,
belki te l' mın rehım bıkrı!

Xwe wê vecarê mın lao,
mın ani dergistiya te,
nivi xwûn, nivi şekir.
Ev bı xwestna dilê te,
kes lı te zor, zorbeti nekır...

Xweş û xweş hûn dıçûn berhev,
yek jı yeki kê m nedkır,
Bigri, bınale yek jı we,
ya dın, dil û ber lê aş dıkır...

Û mın gırt bı evına dilê te
xêliya serçav bılinkır.
Berê wê fetlandım ber bı te,
sing, eni, gerden vekır.

Gırtım bı zıraviya nava wê,
dawşınım weki dara tuyê..
Hêjandım jê zinet, xezine,
gol, avzem, çavkaniyên wê..
Ew komkır lı ser daw û pêş,
nerêtim xwar û erdê..

Paxır-kromên xwe l'çal, lı kêş,
herçı zêr û zivên wê,
Komır- sıfarên wê danim ser,
ku nebın jê ra derd, serêş,
nebın giraniya canê wê..

Anim ber.. feqirên wê, belengaz,
berxên wê, beranên wê.
Heryên ji ci-warên xwe bûne,
karker û cotkarên wê..

Navên şoresker û pêşverû,
şer û şervanên tarixa nêztr..
Bedırxan, Ubeyddullah, Şêx Seid,
Terqa Agri, Koçgiri, Nûri.
Ew serhıldana Dêrsimê,
şerê pêşmerge, Barzani
lı pey hev min de rêzkr...

Û , me ew kula HELEPÇE
lı İraqê ew du sal berê
lı bin bombênên Saddam,
Ku tevihev tê da şewitin
çıvık xwe difirin lı esman,
Pênc hezar Kurd lı xwarê
mırın.. ku ji pez û giya
tışt neman ji xweliyê pêştir!

Lı ser xwe ji rêzkırım,
qûrqûşûnên dilê wê,
kul-bırinên wê yên ku,
Ne ava Dijle-Feratê,
ne behra Wanê-Xarpêtê,
Xwe têra pakıjbûna wê nekır,
zelalkırnê ra têr nekır!..

Xwe çiyayên bani
 merg, zevi, danim ber,
 Kışandım ava çemên wê,
 hınkûfên ava Kewser...
 Jî Mizûrê, Xabûrê, jî Mûrad,
 Xozgaşinê, jî Diyala, Zap,
 çeng bî çeng werkırım ser..

Mî civand teyrê wê yê belavok,
 gogerciin, piling, kevook,
 kew û qûling, zengilok..
 Fîrandım lî ser newal û gêdok,
 bî rengê havai fişeng
 çûn-hatın lî dor, lî der...

Jî bihna binevşên wê, nisanok,
 pîrpızêk, şilan, adarok,
 Lî ser wan xûnafên berf û teyrok,
 gac çêkir, min lefand gilok,
 weki gog, danime ber..

Bî dengê ça, şîrav û çemok,
 gûrmina birûsk û ewrok,
 Goga xwe kırım dev kevok,
 bû bîlûra nava dest,
 çûn-hatın pêçi lî ser!..

Wê danim ser pelek çînarok,
 şıklê hiva çarde roja dev kenok,
 Ew hiva ku lî ser çemê şevê,
 av dî bîni da dihêje,
 pê ra dîke leqleqoq..

Ewê hat, xwe lî pêş te dani,
 xeberda, bû civika hehecok.
 Îns û cîns mest bûn, heyran jê ra,
 yên wê dit, lî ser bûn lal û kerok.

Çı ji xwe ra bêjim ez lao?
çı xweliyê li xwe kım?
Ew ji ku alikaryam nekır,
ewê ji dev li te venekır?
ji xwe va derman lê bıke,
hê ser da ku bırinam derkır?.

* * * *

Lê disa, mın umida xwe ji te,
te ji xortê xwe nedbirrim,
xwe ji ber te nedam ali,
Xwe mam bı evina te bışewrim,
mın derxe ji wi hali..

Bı te ra çawa bıpeyvım,
bı kijan zıman, zaravi,
Xwe belki jim ra bıgot
kêr dıhat, devê te vedkır!.

Wê jim ra qala **Lori, Sorani,**
Gûrani, Kurmanci kır,
Zazaki li rû dani.
"Yek ji yeki kêm bıbe" got,
"wê ya dın, xeberdanê bıke bir."

Ev pêşniyar dı ci da,
li dilêm ra ji xweş hat,
Ketım xwe nav zaravan
Kurmanci ji xwe ra bıjart.
Ev zımanê mın û te,
me werger hewce nedkır.

Lê, beri xeberdana me,
xweş bû mın çarek dın sazıkır!..

Gotım ku, ez deynım dilanek,
helbet pê bıghijım hedef.
Rastkım ber me barigehek,
bı dar û ber, çimên kelef..

Bı kêf û cejn, bergiftek,
emê xem û giri bıkın def.
Bı ritım, bı pır û tertibek
şahiyê şûn da bıxın sef.

Lı ser vê fikra delal,
xwe ra mın raxıst ciraxek
xwe gırtım berpıl û berqef.
Lı ser xwe danım textê qralek,
çarali bı mohri, neqşên sedef..

Milê hevda, wan kırme hindûr,
Zina Zêdan, Memê Alan..
Dest wan da ney, nay, ziza bılûr;
saz, zırnê, tenbûr û def..

Ew xwe rûnıştın b'aşiti, bı hızûr,
lı ser ev textê bav-kalan,
Bı eslê xwe ne kêm, ne qısûr,
bı rêk û pêk, ref bı ref!..

Ewan xwe bı xwe ji
gazıkırın Siyabend, Xeca mehmûr,
xwe herdu benginên bışan û nav,
Ne bı derba xençer, ne bı zora şûr,
dane hev rûmet û şeref!.

Em xwe Kurdê dora wan, fikırın hûr bîhûr,
gelo ki ji wan xelef?.. ki selef?

Berê xwe da zêwatên kîbûr,
gulav belavkır Xecê,
Desta da iskanên fexfûr,
weki bıkebe lecê..
Aram kır ber dılan, bexşkır huzûr,
ev ava bıqedr nekır telef!.

Wan bı hevra dest pêkırın,
lêxıstın mırx û beyit û stran,
Nalinên Kurdistanê, kulê dılan,
zargotın, lawın û klam..

Ew dengê xwe çûn erş-esmanê Xwedê,
kennın, yê ku wan bıhistın gırıyan.
Lo lao, halê wan ra **TE** bitenê,
TE mûyê canê xwe nelekand...

Çı kın çû çewt û tewş lao,
cehda wan ji, xwe bı kêri te nehat!..

Xwe gotım çı dıkım xwe têri nay,
ez werım kezeba xwe wekım.
Eger bırina mın bıbını,
dıbe ku te şifa cenband!.

Lo lao, hê destê xwe navêtmê,
gırt dûmanek ser û bın,
Nızam lê kır, te çıkır pê,
te çı bıxûrdan(!) pêverkır?..

Yekcar bû agir û bizot,
xwe da neditim sebir..
Min kır qûlek tari, qûr û qot,
xwezi bı bir, çala qebir!..

Dest-pêçi xwe tê da weşiyam,
her yek bı aliki va çû.
Seri xwe ji gowdê qetand,
ew nizam xwe kû da çû?

Xwe bûm yek ker û gêja hovi,
nızan bûm çi rê, ali va herim,
ji xwe ra li kê bıgerim,
ez bı kê, bı çi bışewrim?

* * * *

Lao ew
das bû, bıvır bû, tewır,
bı çi derb bû te li mın xıst?
Hındurê mın hûr-tarûmar kır,
xwûn ji dervay xwe nedihat!..

Çı çûyin-hatın te çêkır,
li ser dilê mın mewat?
Bı derzi koland, parçe kır,
nehişt misqalek tewat.

Ezê qûrban ım lao,
ku mın çi kırî û nekır,
dilêm xelaskarê xwe ku nehat,
Lı ser xwe pûçbûm, şewitim
berfa gewr xwe l' mın nehat.

Lê, bî tenê ev bû min didit
 hundûrê min dîqewart,
Girin dîçû, xem dîhat,
 xem dîçû, girin dîhat,
Gav jî gavê zêdetir,
 xwe bîlind dîbû qat bî qat!.

Derdê te, giranê derdan lao,
 ne evê herro l' meriv bîhat!..
Te çî xêr, çî dît gelo ku lao,
 ev çî git bû jî te ra hat?

Tu çiqas bî jîyanê tîjî ,
 te çiqas jî ev mirat hesdîkîr!!..
Ew jî diya xwe ra te hişti çûy,
 bêy te wê, min jî xwe ra çîd'kîr?!.

Bêy te mal bî gel tîjî,
 ez bûm ew ewa bî tenê,
 kes lî ber dilê mî nedîhat.
Ber bî te dirêj dîkîrîm dest û-mîlê,
 ber bî min vala dîhat!!..

Herkes derd-etriya xwe da,
 kes bî xema kesi nedîhat.
Êşam lî hevala, tira l' kendala,
 ev min diêşand... û dîbîland!..

Lê ew zanibûm ez
heriyên xwe dostê me bûn ew,
 xîstîbû te lî dilê wan şewat ,
Heriyên nexwazê mebûn jî
 heyfa wan lî te dîhat!..

Her bî awayi ji ez,
Dostê xwe ew bûm ku girin,
şermok, li ber min dîçû-dihat.
Girin, bê xweyi û bê xwedan,
jim ra nêz, hemraz dihat.

Gav bî gav wê bî destê mî girt..
mî bir gerand bî xwe ra,
mî bî xwe ra kir cem û wîrd..
Wê got, ez giriyam, giriyam,
pê ra ketim gîrd û cîrd..

Ew kû da çû, ez ji çûm,
giriim, giriim, giriiyam,
giriyam xwe pêra çûm..
Wê digot ez **digriyaam, digriyaam,**
digriyaam... ji xwe dîçûm..

Têrbûn, rehetbûn tunnebûm,
deri-dîwar bûn neyar,
Dixistim serê xwe li wan,
li wan dîkirme hîcûm!!

Yek hespê kîhêl bû ku girin,
ez sûwara wê rewan,
serê xwe hîldabûm dîçûm!..
Digriim, digriim, digriyam,
cîrid bûm çarnal dîçûm.
Nîzam buhuri xwe çîqas zeman?
mî go bûme li xwe wext temam,
ev bes goştê xwe dîcûm!
Weki xwe ketibûm nîya rast,
ber xwe mîrînê va dîçûm..

Şar-şarıstan pışt xwe mam,
welat neman fıriyam çûm.

Hatım xwe sinorê mırınê,
ji gûc û taqet êdi çûm.

Lê gotın, "Ezrail e nobetdar",
kêfa xwe hatım, ber pê çûm.
Ez temam kaxız û evrak,
ji xwe ewle, pêş va çûm.

Lê.. ne texto, mı xıst bınê çavnêri,
cîhêkır, ji rêviyan qetand.
Lê, ne bexto lı hêstirê min nenhêri,
ji kulê-wehcê min teqand.

Ez sekınım.. hê zeman, bı min muhlet.
ku helgırım hê xeman, lı xwe xelwet!
Bıfıkırım ez bı xwe, ka bıgerım sebeb,
ya xwe jê bıstınım ezê ders,
ya derêm ji vi welet..

Ev bû ji mınê ra zılım,
ev bû ji mınê ra zılmet,
Ez ku lı ciyê xwe sekınım,
xwe ditım, ecêb-hikmet:

Her ewên ku ji jıyanê,
nestendıne pasportê xwe, bılet,
Heriyên şa nekırıye wan felek,
rewal, cıwanmerd.. şıkıl melek...
Fidan, ter û can, xortên çeleng,
çavê reş xezali, xwe çavên belek,
heryek cûda j ı hev, reng bı reng.

Yek yeko bûn dû.. dûyê xelek..
derketın pışk, ji eyni kulek..
Qewlê xwe bî mîrnê ra kîrbûn yek,
pîrs-destûr nedbû gerek..
Ew ji vê tixûbê derbaz bûn,
xwe lî pêş mîn bazdan û çûn..

Rê neda.. Ezrail mî derbaz nekîr..
pîşta xwe fetiland, da mîn tenîşt.
Jê pîrsim sûcê xwe, ku mîn çî kîr?
got: "pasportê te bê ispat e, bêrûşt,
Rê dîgre lî herî gulan -şıtılan,
çûndina te dî aqıl,
lî hîşê mîn da rûnenîşt!..
Tu rûnê teşîya xwe birêse,
bîcû bî dîranê xwe ev benîşt!.."

* * * *

Lao

Ez ji wusa mam lî wê der..
ez lî vi sinori..
bîçîme ku?. nîzanî bûm.
Derê mîrnê lî mîn gîrtî,
ji jiyanê dûrketî,
lî dînyek wûndayî bûm.

Kuçe çikmaz

Tîrk dîgotîn eva ra,
jê derketîn tunnebûm..
Dîdame ber avê cerê vala,
çawa tîji kîm nîzanbûm.

Bı çûyin-hatın, bı hale-hala;
mal ûsa qerebalıx nedibûm.
Ketıbûm xewna dem û salan
ji tışteki hay ninbûm..

Ne dengê dar-ber, ne ins û cınsa,
yek kora ker, lali bûm.
Havırdor bı mın xır-xali, vıqi-vala,
xamûş, beyabani bûm..

Şin hebûm.. bı şinahi bûm..
hısa xortê mın nedihat..
Bêdengiya wi mın kırbû bûm,
pepûk kêfa xw bı mın dihat..



De mı dit.. ev ne loq e, nine benişt,
nıkarım bı dev-dıranê xwe bıcûm,
Neçar nıya xwe gûhazım,
ber bı nıvisandinê çûm...

Gotım: belki xwe pê jıbirım(!),
mıjûlkım(!) belki gotım.
Hozan, rexnevan nekırım derd,
ka jı wan ra çı dıgotım?

Lê AZADO!

ku mın ani pêş çavê xwe,
çûyin, hatın, rewşa te,
Nota sûcdar bûm, gunehkar,
mın ji kırna xwe lao
bı tevayi ji şerm kır... şerm...

Ş E R M K I R

Were lao!.. evi cani derxe
 ji nav alavê, ji vi agir!
Bıcemdine bı berf û baran,
 sar nebe, lêxe bager!
Bı palasa baweşinke.. dilê mirat,
 qayıl nayê hey lo-lo,
 bı baê pêşgir...

Lao
Jana tejim ra bûye barûdik,
Dıteqe, perçedıke dilê mın
 gavê-saetik...
Idi nema hukmê :
 tırsa mırinê ku bê,
Bîêş-nexweşinka
 xwe pê bihelım mina
 mûmik!...

Dılê daykê lao, bıbilik e,
 bıbilika qûlqûlik.
Xwûne dadıke nava êşê,
 jê çêdıke loda hevir.
Jı derdê kezebê ra
 dermanê cerbandi ye,
Eviya.. neminım lawo,
 dıkeve şûna sebir...

Lao

Rûyê te ji m'ra bûye eynîk,

lê dînhêrîm dîbêji:

"Emrê te çûye dayê,

maye hîndîk!

Idi nema hukmê:

meh û salên hejmartî,

lî xwe bîjmêrî roja,

daynî serê jî çendîk!"

Te lî xwe çî kîr lao, te lî me çî kîr?

çûy gîhiştî mîrîna zalîm,

derdê xortanya xwe te lî me kîr..

Bînhêre!

dînya dîsa lî dora xwe dîçe-tê,

dîbhûre dewran bî dewr, dewr,

Diwarên Kurdîstana te bîlînd dibe..

Te jî.. danîbû serê..

ez reben îm lawo,

pîşrûk û kevîr...

Lao

Dewa te, jîm ra bûye

rehbenk,

Dîçîrîse lî pêş mîm,

wekî nûra teberîk..

Idi nema hukmê:

ronîya tava rojê,

Xwe şewqa dev lî kena

hîva rîndîk!..

Te jı xelqê xwe ra çı kırıbû lao,
yeko-yeko mı tev berhevkr,
Weki hebên incûya,
wan lı ser gılokek hevrişım
hebo-hebo ji rêze-rêzkr.

Gılok, ku jı destem şemiti,
û.. awê çemê dijleyê,
xwe l' ber mın dirêjkr,
Lı ser te por-gıjkên xwe
mın nani xwarda AZADo!
Mın ji «TE»..., ez bımrım lao!
mın jı navê te şerm kır!..

Lao
Navê te jim ra bûye zıkr,
Tızbiya zımanê mın e
dıkşınım, dıkım fıkr!
Idi nema hukmê;
Hezreti Eli, Emer, û
Hezreti Ebûbekır!..

HEŞYARBÛNA ÇEMÊ HÊSRAN

Çemê Hêsrın! çemê wehcan!
ez dı wê şermê da,
ev gotın devê mın da,
Lerz û taki lı mın kır,
weki dı wecdê da bım,
weki ketıbım zıkr!

Rabûm ser xwe hananka,
ku bîbezîm, bîrevîm,
Hêstîr, lemîştî ku vêcar hat,
taqet, keysê jî mîn kîr.
Mîn tanda, mînê hêjand,
jî xewna mî dit hêşyarkîr.

Heşyar bûm.. lê nîzanbûm,
ew xevn bûn, ya jî rasti,
herî tîştên ku mîn dit!..

Çîma bêkeys westîya bûm,
wekî girtîbûm qotîk,
jî lehiya hêşîran,
şîl û pîl jî, wekî dik?!.

Heşyar î çav jî mîn dit
hazîr î, bênazî ne.
Çemê xwe rakîrîne,
ne kê mî, kêmasî ne.
Lî hêvya mî î bîbêjîm,
menzîla me çîqas çû,
yê şûda çîqas mane?..

Jî bo çemê xwe geşkîm
rabûm ser xwe, piyamo,
Dest pêkîrîm û gotîm,
lî hev anim kelamo...

Mî go :

-Çemê mînê delalo!
hati jî ava helalo!
Zehmet, cefa kîşandi,
bûy bîqasî mî melalo.

Heta vira em hatin,
em bûn xwe ra hevalo.
Niha virda bibinin,
tê serê me çi halo?

* * * *

Çemo çiroka min diqede,
hat ber devê xelasi.

Seri bî giri lêxistim,
dawi nekîr dîlxasi..

Qebriştan, PERLAŞEZ,
mezêl, mî got,
nebû qala mêrxasi...

Idi rê, xwestin ewa te,
nêzi xortê min dîçi.
Qene evya da hebe selamet,
rehet bibe derbasi..

Qûnaxa te pîr nema,
jî vîr sed, pencî gav e.
Bikevî milê rastê,
ser şerîta hefta be...

Kaniyek heyî navbera we,
bêdeng e, bêgiyan e..
Bala xwe daye xortê min,
bêşik e, bêgûman e...

Zelal e, dîbîrîq e,
nay jî wehca dîlane.
Qîz û kûrên xwe tunnîn,
dê nine, nine bav e.
jî xortêm ra deng dîke,
şîrina xwe sîlav e...

Çemo!
ez dıbinım ber xwe va
 bı lez û bezê tu dıçi.
Qe nabêji Tebax e,
 haviin ee.. tûj û tav e.
Dema behsa kaniyê bû,
 çawa gotım ev nave...

Te şitirê ku reqib e,
 rê lı te dıgre ew rave.
Tu bibi seri nahêle
 ev bar, ev doz û dewe...

Xem meke, metirse çemo!
 ev diyar, ewledar e,
Tu çem û kani, tu behrê,
 ji te ra nakım emsal e.
De va, tu ghişti xortê mın,
 lı xwe meke heware!..

Aax, aax, çemo!..
taqet nemam dı xwe da,
 de bide muhletık, are..
Hate pêş çavê mın va disa,
 sala serxwûr, bê oxir,
 xwe peşkbireşê par e..

Qala germ, tav, Tebaxê mı kır,
 ani bira mın sala parinê..
Rûniştım helbest lê dam,
 danim ber mıqama lawinê..

Bıxwinım ji te ra çemo,
 gûh bide hawırdorê.
Çavdêrike, mêzeke,
 kes neke bore-borê!..

Havin, ji bo gelan, merivan,
xweşi-geşi; zerê, gula sorê.
ji min bîpirsi weri
agir, şewat, xûri yê, gorê...

Nakeve hindûrê dilê min
wexta hatina wê ku bê.
Derê dilê xwe lê dîgrîm,
dixim bin qeflê, miftê, morê..

Dayka xwe ra bîbêjim,
sedem xweçî ye, çî zor ê?..

LÊ - LÊ DAYÊ (*)

Lê lê dayê,
Qêle-qîja havina parin
erd û esman dikeliyê,
Hesinê binê tavê bûbû
rûnê nîvişk diheliyê.

Me ji xwe avêt ber av û behra,
bin sîtarên hênikiyê,
Qe hay nebûn, ezrailê behrê
ser xortêm mina klor lifdaniyê!..

Lê lê dayê,

Dil bû ewrê kul û wehca,
davê peşk û dilopên baranê.
Diçe ber bî çemê Dijleyê,
hêla Gol Xarpûtê û Behra Wanê...

Xêra Xwedê ra AZADê min şivan bûya
xwe li ser axa bav-kalanê,
Ne me ew bû hesretiyê Kurdistanê,
xwe bî rûta(!) şehid li biyanê!...

Lê lê dayê,

Mî go w'ezê xwe herîm rûnê
li ber derê qebriştana **PERLAŞEZÊ,**
Sîlavê bîdîm alî rastê,
bîfetlîm çepê bî hewla lezê.

W'ez bînêrîm kî d'be xweyê vê axa wêran,
kî yê xwe tê da hewandiyê,
Jî AZAD êm ra îro kî dibe mêvan,
xwe jê ra dîke hevaltîyê!..

Lê lê dayê,

Çerxa dunê, bî çî hesin e,
bî çî zincîr e xwe girtiyê?
Qewî ye, hîşk e, naçe-nayê,
mewatê jî hev naqetiyê...

W'ezê çîbkîm bî feleka xwe xayînê
jim ra bîhar, payîz sazkrîyê,
Ku mî nedit AZAD êm xwe tê da,
xortanî jî xwe ra derbazkrîyê?!..

Lê lê dayê,

Tu lî AZADê mî nî dînhêrî,
devê gîrtî lî çavên xazal nayê...
Bî nî pozê zîrav, sîmbêl dîrêj nekîr,
ew bî têra dîlê xwe nebadayê!..

Xwe bî sînce û bejna xwe lî hev,
mîna derzîya zêr, hewrîşma tayê,
Bî maqûlî sekîniye lî ser pîştê,
nake gazî n-gotî nê n beradayê!..

Lê Lê dayê,

Rûyê AZADê mî nê nermîk,
mîna hewrîşmê nav pembûyê.
Bî nî tavê da lê dî nêrtî hê nîk dîbûy,
hesêbî rûnîştî lî bî nîya sîyê..

Mî nî dîgo w'ezê bî mîrî mî, wê xortê mî nî
dayka xwe daxê bî nî xelîyê,
Bêrîk bêrîk ax lî mî nî ke
mî nî ev daxwazî bî xemlîyê,
W'ez nîzanbû mî, wê l' mî nî qotke navpîştê,
xwazîyam bî nî dara bîyê!..

Lê lê dayê,

Çî ye hewalê AZADê mî nî,
awîrê nî xweşîk navê bala mî nê?
Mî l-porê nî mî nî nakşîne, nabêje:
"Çî qewî mî lî anoşka mî nî,
anoşkam çî ma dîgri-dîlorî nê?"

Qey nızane, bedewi û xortaniya xwe
jîm ra kiri du werisên hêlekanê,
Xwe bî wan dihêjinim, bî yeki digriim,
ya dîn mî dinaline.. ez jî şaş im,
ji herduyan w'ezê bigrim ka kijanê?!..

Lê lê dayê,

AZADê min lî ser xwe dadaye,
deri, şîwakên xapinoka dunyê,
Rê nade kesi, jê ra kêfê binin,
ha jê ra bîkin behs û bala xemê!..
Awê wi xwe dûr xîstî jî pîrsgirêkan,
ji zewq û sêfa vê alemê,
Xema wi ninbe îdi lî pey xwe
dayka wi, hevya xwe bî çî tine..
ha bî girin be... ha bî banginê!..

Lê lê dayê,

AZADê min çawa mijûl nayê,
nagere lî cejnê, lî eydiyê?
Xafil e jî Kurdistan-welat,
agirê lî ser Kurdan dibariyê?..

Awê ku xortê min xwe daye ali,
tofan lî kû, xwe l'ser kê hatiyê,
Dayka wi wê liber çî bisekine,
bîkeve ber çî kêf-îmûd,
çî derd, kûlê, çî etriyê?!.

Lê lê dayê,

AZADê min, ewê paşerojan,

hêna xort-tezeyê jiyaniyê,

Lı bin barê xwe giranê bı rûmet,

bı rengê welatparêziyê...

Xweyê soz û qewla, rasti, dirusti,

ser navê mêrantiyê, mêraniyê,

Qedr-rûmeta Kurd û Kurdan

xwe lı yaban êlê, lı biyaniyê...

Lê lê Dayê,

AZADê ketûm e, xebernade,

rê lê hatiyê, nehatiyê.

Nabêjê lı Bonn, Berlin, Strazbûrg,

derdê wı çı lı Pragê bigeriyê?

Lı Kuba, Korea Bakûr, Danimarkayê,

dıla da derd û kula dergistiyê,

Doza welatê xwe l' wan dûr diyarên,

jı ber çı xem û kesrê dajotiyê?..

* * * *

KINGÊ DIKIM

De lê lê dayê,
kingê behsa **AZADÊ** xwe dıkım,
awê çırok seri dıxım dawı nayê.
Hezar bıhnok lê datınım,
dıkım-nakım nıqte lê nayê...
Kingê bıbêm **KURD.. KURDİSTAN,**
navê xortêm ya lı seri,
ya lı bin e, ya lı dûra yê.
Bı fıkr û gotın çıqas nêzi hev bin ew,
bı esasi hê jı hev dırın,
yek lı deştê ye, yek lı çıya yê...

Ew herdû bı hev ra
bırına mın har dıkın, xedar dıkın.
Dost û yarên hev ın ew,
ez ım berdestiya wan,
xwe lı mın nakın merhebayê..

Ew herdû bı hevra
kul-janam dax dıkın, xeraw dıkın.
Evin, benginiyê hev ın ew,
ez ne lı gori dilê wan,
ez lı xwe bextê êtimayê!
Ew xwe herdu bı hevra, ew xwe çıma
jıbir kırın tore, adet,
Dilsoziyê behsê nakın ,
emel nakın bı wefayê!..
De ku mı go, "**Ez Kurd ım**" lêlê dayê,
ma qey ez ne insan,
ne lı mın **mafên merowayê?**

Çemo

dîlê xwe dibêm

wan lawinên xwe emê

bîdine hev tu were!.

Nehêlın lı koşe, qûncık,

bıkın kîtêb-deftere.

Jı ber ku

ew pêti ne, ew avzem,

heyf in mina xortê mın,

xwe, jı xwe ra neçın hedere...

Jı bo ku her rêzên wê,

bı figan e, efxane.

Xwestine kaxez-qelem,

bınvisinin wehcane.

Xwestine,

yek-yeko bên kışandın,

bıbın tizbiya sebrane,

Dıl bıbe kaxızê wan,

qelem bê, lı ser here..

Jı ber ku xwe bên-bıçın

nav dılên bıhês û bêhusane,

Dılê daykê rehetkın,

benigara wergere.

Gel ji, xwe jı xwe ra bıbinın,

jı ber çı kul-derdan e,

Dayik naçar dımının,

heldıdın kaxez, qelem

xwe dınvisin şîêr-e..

Çemo, nızanım ez disa,
dî kûda ketım, derketım,
serê xwe xıstım lı çî darê?
Dî mışkula xwe da xelwet,
xwe nabinım paş û pêş,
ne jorê, ne ji xwarê..

Lê mina kora bêşıvık,
lı kû bıxım serê xwe,
Derdikeve pêşiya mın,
AZADê ÇINARê mın,
mın xwe guli yê **ÇINAR** ê..

Ji ber wê yekê ye de,
car carna te jibir bıxım,
lı serê mî meyne xedarê!

Lê va ye çemo!
gıhişti **AZAD** ê mın,
way hati hema berê.
Bûy şırav û çırınok,
deng dıdı dor û derê...

Lı dora wi çûy-hati,
gırti keysê, deverê.
Û **Ala rengina ji kulilk,**
xwe nerma rûnê nıvışk,
şemıti ji ser te sıvık.
Bû ji etlas lıhêfık,
xwe weşand, raxıst lı serê..

Xwe raxist ser singa **AZAD**êm,
lî ser singa wi pakij,
dîlê xwe zêrin, gewherê..

Çar hev stêrkên şewê,
xwe danin ser koşeyên wê.
Ser herdu berên xwe teng,
herdu fire berên wê..

Çırsandın alayê,
keska me, sor û zerê.
Xwe jê ra kırım notırvan,
bûn bekçi, dergevanên wê..

Çemo mektûbam jî birnek!
lî ser singa wi vekî!.
Te dit ku emel, îtbar pê neke,
tu jê ra bixwin bîdevkî!..
Lî xwe, lî me wi çîkır,
xwe nîzan be jî belkî...

Dixwazım bra bîzanbe!
ocaxek dani nav mın dîl,
tu jê ra bêje tîfîk.
Tîfîk korê, nakşînê,
dîfetsin dîl û gurçîk.

Ne dûkêş e, ne kulek,
ne lê dîrûvê kuçîk..
Nav dûmanê da dîfetsım,
nej' dev davêm, nej' dûçîk..



Herê lawo dibêjim
şika bibê!

b1 ç1 ecelê, b1 ç1 lezê,
xwe nav wê da derbaz bû
salek û meh, piçek zeman

Tu bûy cıranê

QASIMLO EVDIREHMAN,

serekê Kurdistanê Kurdê İnan,

L1 Qebristana **PERLAŞEZ** ê,

l1 ser axa Fransızan?..

Çıma l1 ser axa bavên xwe

şûni, sitari nebûn hûn,

Hûn iro kırêdarên mîlkê xerib,

Hûn iro xeridarên biyanıyan?

Welatparêzên weki wan, weki we,

çıma ewqas biçın ter û can?

Bikevın lepê mîrnê,

xwe têr nebın j1 giyan, jiyan?..

Reben ım lao qey roj-dem ber we ninbûn?

Qey hûn hew bû bixewtıyan,

xwe j' bo weten, nıştıman?!..

L1 pey we, em dıqêrının,

em l1 pey we dıpirsın!

Wê kingê welêt nızgar,

serxwebûn bıbe?

Heri niştimanperver, şoreşkerker,
heri şehidên lı yabanê sîrgûnvan,
Xwe kingê vegerın Kurdistanê,
nebin ji sax.. haydê nebinın ji
xwe bî ditina çavan?..

Wê ezê ewıl bîşewtım l' ser kê ?
de bêje lao! lı ser evan de kijan?
Lı ser we?.. ser xortaniya we?
lı me, xwe l' me **dılên dê - bavan?**
Ya, lı ser dayka me hemi,
ewıl **xwe l' dayka Kurdistan?..**

De tu bêje, tu lao!
Dı van kijan da zêdêtır heyi hicran,
Dı kijan da pırtır dışxûle gelo ku jan?!..

De were lao!
de were xwe neşewıtım!..
De bra b' hezaran xortê Kurd,
navê lı ser xwe AZAD ın,
De bra bên, de bıla bıçın,
welatê xwe azad nebinın!
De bra ji xwe ra bihnekın,
gulên Kurdistana xwe azad,
sumbulên wê azad neçının!..

Idi dunya ji zane lao,
ji do ku em gihiştın heyani iro,
Gelên Kurd hatın kuştın,
bı hezar.., hezar.., hezaran...

Pîrên wan j'ali hikûmata Îraq,
bî destê devletên Tirk û Îran.
xwe bî lasebeb, bî laheq..
Nexwest wan xelkê me, xelkê wan
bî hev ra bîbîn dost, bîbîn yaran,
Nebiyên me xwûna xwe
nivi jî me, nivi jî wan..

Tevayi ser navê "yekiti, xweyiti"
wan jar li damarên me kirin zerk!

Ser da jî nebîrîrî qet,
rêtî xwina me bav-ewlad,
jinên me, zarûkên me, pir'mêran!..
ew ku li serê me kire teq!..

Jî bo ez jî berdîlê xwe bîdîm,
xwe nexîm binê tohmet,
Em jî Kurd in, ez bêjîm.
XORTÊ MIN jî YEK jî WAN!
dî nava me da nine ferq!..

Lê disa ku mîrîrî pîrayî bo me,
rehetke dîlê zorbe, xwûnxwar,
Kîşandîna wê zehmet lao,
dîşkêne pişt, gîrikê mîlan..
Zor e lao!.. çetîn e!..
ev.. malxerabkirîna gîran,
meriv li serê dibe xerq..

Lê aax lao!.. ax û ax!!
de çiqas bıkım ax û aax
Çûndına te BÊWEXT ra
ezê lı ku bıgerım,
W'ezê bı kê bışewrım,
hebe diyarên teseliyan,
xwe hebe starên efan û bexşan
Heyani xwe dınya belek
ezê xwe ra nekım terk?!

* * * *

Ezê qûrbanê lao!
bıbexşine dayka xwe!
nayme vır, ba te hergav,
Ez deyaxa xwe tunnınım,
ne lı xwe qûdûm, bavêm gav.

Lê dıkelımım.. dıkelım bı agrê te,
ez diya te reben ım!..
Dıkım û nakım napıjım,
xwe hê lı seri me, hêna xav!..
De dıl e.. dılê dayka te lao,
ev ne hesınê bıne tav.

Lê mın çêkır evi çemi,
jı lesara hêsrın.
Kır qasidê nava me,
gavê, saet, daqıqan..

Ev hılhatiya serkeşi,
xwe avêt jı çox û bendan,
Kete şûna telqraf,
şûna telefon-faksan...

Bı zımanê şîera,
bı hunerên helbestan,
Dıçe-tê nava me da,
weki baê zozanan...

Xortêm dilê xw neşewt bra dıbêm,
ez dayika te hêsirım..

Heta bı rûh, xwe dıbinım lı piya,
bı beytan te bıbir binım!..

Heyfa te bıstinım ez wusa,
de weki dınê xwe çawa,
lı rûyê dunê bıminım?..

Xwe dıxwazım
lao ku nebêjin:
"Dê ye, bı êşa lawê xwe,
wi kırı şexsek mezin,
Adet e, dı mersiyê da
gerek e hebın pesın!.."

Rast e ku, heri mersiye
bı pesın têne kırın.
Rast e lê belê ev jı,
lı ser her kûrê dê-bavan
destan nayên rast kırın.

Sedem ev e ez ewqas
lı ser te dışewıtım!
Tu emekê helal i,
ne hewcê mezınkırın!..
Zanım tu layıqi wan hêsran,
jê çem hêsıran çekırım.

Balê xwe bîde min vecar,
ev çem ku çawa li me hat,
çawa ji werêkîrim.

Ez ku fetulîm xwelî wê
belengazi lê kîrim!..

Xwe jê ra gotim ku çemo!

Tu ji çav derketi çemo,
bî jan û bî kul, elemo.

Bêhîs-bêdeng çûy-hati,
te gerand ev aşê xemo. .

Ev te ra umîd e çemo!

ji dilê te ra melhemo.

Nema li te wext, zeman,
najmêri sal û demo..

Te dûr xîm ji derd û xemo,

ji rojên bî axin, bêgemo.

ew rojên te l' me barand,
kulên bê lituf û keremo..

Te hêstirên barand bî lemlemo,
min civand mîsqal, dirhemo.

Ev kîrim qelenê **KURDÎSTAN**,
XELATA xortê xwe mo!

Bîgîrim desmala xemo,

baweşînkîm li pey te mo.

Te bî awê zeyî werêkîm,
ez dilgir dayka te mo.

Bîkêm û qûsûrê xwe çemo,

erka xwe te kîr temamo.

Hati gîhiştî dawîya xwe,
lê ev ne dawîya xemano..

Mexwaze bîha û bedêlo,
xwe j' me ra alê bîhêlo!.
Şîrina xwe ji bîbirre
meke karê cîhêlo!..

Xwe îdi bîqete ji me
şev be, dîxwazi bîro!.
Em bî serê xwe bîminîn,
nekî xem çavên şîlo...

Xwe here bî xêr û oxîro,
mey serê qûl û guro!..
Kezebên dayka neşewtîn,
çênebîn **çemê wîlo!..**

AZADko, lawo!
bî oxîr û bî hêvi,
xwe çemê çavê xwe verêkîn.
Bîminîn ez û te, ala rengin
çar koşê xwe sîtêrk in.

Ne hewce êdi min lao,
her ava bê j' min çavo,
bî navkîn, rîmûz lêxîn.
Derdên xwe mayî bînêrîn,
wan jî xwe ra bî rê xîn.

Dîxwazi eva ewîl bîbêjîm,
dî heyriya çî da ez,
çî jî xwe ra dîgerîm?..

DIGERIM

Lao!

Ji xwe ra hevalek dıgerım,
weki nivê mın, yek şeqay mınê.
Bigrim, jê ra bıqelêşım dılê xwe,
nehêlım bı mısqala xwûnê...
Bıbinım nalomine, û dıxwaze
em dı yek agrı da bışewtın,
Ez bıbım tıtûna hundûrê wê,
ew, lı xwe hilde erka qelûnê...

Lao!

ji xwe ra hevalek dıgerım,
raste-rast bıkeve hundurê mınê.
Nivê kula mın bıstine ji mın,
yê mayi bıhêle para mınê..
Lê, te l' kû, te ji kê bıhist AZADo,
êşa ewlad hat fırotın,
bû para hınkên dınê?
Bra çavê dayka te bırijê de lao,
ku digri, bra diya te bigri!..
Tu ne ewê hêstrên derewinê...

Lao!

Ji xwe ra hevalek dıgerım!
ne ji mın dırêj, ne ji mın kınê.
Ev barê xwe em, hevra hıldın
weki ku cêwi hatıbın dınê...

Ku kula xortêm bibe tira dilê me,
lî yeki xe, xwe ya dînê da derinê.
Xwe «lawo!» kır, bigri yek ji me,
ya dîn seri xe, xwe nav AZADÊ minê...
Lê.. dayka Çınarêm nemine lao,
ew ji zane çıma gotine,
"DE yek e... DUDO ninê!.."

De qey ew ji ber yekê ye... ku...

NIZANIM ÇIMA

Nızanım ne bîrçi me, ne ji têtım,
bî çî awayî dîkenım, ez lî çî dînêrım?
Bîroj her demên xwe bî te ra ji bûbhêrım,
xevna dîbinım bîşev, xwe j'mın dûr dîxi,
Sîtû xwar, dîlşkeşti, ev çend...
.. ez lî çûndına te dînêrım!...

Lao lî vîr bîgerî, mîzgeh tunnın,
der-dor tev kılise ne, xwe dêr-ın.
Ecêb ım, merîv ber bî wan dîçın
jê dîstinın çî çeşîtên xêr-ın?

Carna dibêm herım, birina xw vekım,
hinêk xêra xwe lê binhêrın.
Lê, ku ji devê wan sehnakım lao, nızanım
melhem ın ew, ya daxvanên ter qûner ın?..

Lao, xwe wekê mınên ku
ne xêr e dı wan da , nin ın bikêr ın,
Dınyê tiji kırıne, xwe nızanın
wext çewa derbaskın, ya bubhêrın.

Ew nızanım mırına kambax, xwe çıma
ji bo egita erzan, belaş e ewqas,
Her bıha ye yên weki mınan ra ...
nay standınê.. bı hebhebên perê zêr ın?..

Hatın û mayına rûyê dinê lao,
xwe ne merıfet, ne hunêr ın.
Rabûn-rûnıştın merıv bı xwe hindıbe,
ew ne şıxûlên sır-sihêr ın.

Lê nebûn çêtır e ji bo wan kesan ra,
ku weki heywan xwe bıçêrın,
Lê walle lao ev bela ye,
lı heyf û yazoxam pır tê,
Şûna te AZADê xwe yê
dılşewıtiyê ser welat da
ez.. lı xıyalê te binêrım!!..

* * * *

AZADo, ev nihêrtin mewato,
her çiqas bê li min giran,
Lê çerxa felekê digere,
her kê kır ku nava dîran!..

De waye
ez û te, xwe ra em bi tenê man,
Bizari mebe,
meke ji destê min el-eman.
Ku ji te ra devê xwe vekim,
dest bavêjim siteman...

Nebêje, xwe ji kû derketim,
xwe bê xeber, bê ilam,
Min te ji xewê heşyar kır,
te didit xeyal û xewnan..

Te didit..
Sal, hezar û nehsed û nod,
Meha heyşta, roj hijde,
ro orta roê, wext bû nivrok.
Em ji çadîrê derketin,
Sed û hijde numrê xwe,
li ser erda xet-xetok.

Hawîrdor tîji erebe,
her yek ji hevdu cûda,
awê kaxîz.. belavok..
Şemi ji rojên Xwedê,
dest li me kır ev çîrok..

Em lı bazarê bûn ew roj,
nızanbûm te çıma dıxwest,
xwe bifetılın tafılok?
Bavê te ku jê dernedket
market xwe j' me çend gavok.

Em lı benda wi em her sê,
TU , Bıjar hûn erebê da,
ez lı bın dıvarê kevırok.
Germê, ew roj germa xwe dıkır,
Mewatê laş ku dıkire hevırok..

Te aram, saman qe neda xwe,
dest-pêçi nesekının,
wek dırêstın tentenok..
"Lı kû ma bavê m, anoş?!"
Anê bavê m lı kû m a?"
Te hıjde car bû ev pırskır,
hıjde cari, te ev got!..

V egerin em axırê, bavo xwe hat,
nızanbûn lê em ber bı kû,
ber çı qeder bû dıçûn?
Nızanbûm
te demên xatıra ne ew dem,
te ıdı devê xwe venekır,
te êdı tışte k ne got!..

Te xatır nexwest, nebhıstım,
nedıtım te ber behrê va ajot.
Kingê gıhişti mırınê,
kingê hûn bı hev ra xwe bûn cot?

Çawa êşiya canê te,
qêrin kîrî te çî got?
Çî bû xwe gotna te paşin,
"Bavo!" kîr, te "Dayê!" got?!

Ewanan ezê jî kê bîpîrîstîm,
kê gîrtî be nîvis-not?!..

Jê bêri mebe lao, qene bîbine,
jî çî derbas bûm ez lî pey te,
xwe jî çî deman bîhûrîm?..
Çî bû kula mîn û te,
jî wê roj hetani vîr,
dîgrîm xwe ra, dîlûrîm?

Lî ser te çavên mêşîni,
xwe çîma qeşûr, qeşûr îm,
Bî awê arê genîmî,
tev lî hev, hûr bî hûr îm?..

* * * *

Ferz bîke lao, lî xwe gêj îm,
vîrda dîçîm û vîrda têmo,
Tu pîrske, çî lî xwe zêde,
ez çî xwe l' xwe kêmo!

Serboriya xwe jî te ra gotîm,
xwe wekî gavên ku te dîkîr,
disa, disa tu jîm ra bêje
"Yok yaho?!, Yook yaho!
Tuuuh bee! yapma yaho?!.."

Ku pırsım, "Te bıhisti lao,
ev xebera gıran, xırmalo?
AZAD çav dayka xw rê!" bêjim,
Qe mebê "Yook yahoo?!"
"böylesin yapmaz Oğlun!"
(yaparmış meğer lao!)

Bêjim, xwe kula te jim ra lao,
bû şiv-taştiyam dan û gavo.
Ku danim ber te tu mebêji,
"Ne biçim yemek bu anne?
"Yenir mi bu da yaho?!"
(yenirmiş meğer lao!)

Bêjim ku, binêr lı çavêm lao!
ketın bın perda xımamo..
«Te dayka xwe kuşt AZADê» bêjim,
mebêj " manyak mısın sen kadın?!"
"Oğlun yakar mıymış canın?!"
(yakarmış meğer lao!)

Bıxwine, jı mın bawer neki bêjim,
ew lı mın bı rêz, sırano.
Eva te lı mın kır kejê mın,
neyê serê hırça, gurano:

«Söyle ne yaptım sana?» bıırsi,
hêrsa xwe disa xwe j' mın bini,
Singa xwe vekım lı ber te
şerm nekım tu l' xwe mêr i.
Hesêw kım tu mın ew i,
tu mın ew qızam xama lao!

De gelo heye
xwe tu vê car ji bêji
"Anne ne olursun aġlama,
kurban oliim aġlama!
Ne olur anam aġlama,
kurban oliim aġlama!.."

Çıbke
xwe ana hêsira te,
xwe nebû qûrbana te?
Hê... ser te da derbaskır
sal-demsalên xwe dirêj,
bûn jê ra ezap lao!!

BEŞA DUHEMİN

*Lao ;
Mîrîn lê tengî bûya,
bîket derengi bûya!
Xortanî bîhîştâ jî te ra
hê bîhat kingê bûya!!.*



ÇI B Ê J I M

Felekê li min daxîst mîzgina hewarê,
li biyanê, ro li berava, dan êwarê,
Xortê min çavê xwe girtiye go,
dev û destê xwe lê bûye sarê!

Ûy li minê ûy!.. w' ezê bîkîm bavo, dayê dayê!
Ûy li minê ûy!.. de w' ezê bêjim hal evhayê!..

Ev berê êwar e yadê, ev danê êwarê,
û germ e, û agir e, û dîbarê!
Felekê xortêm jî mî stendiye,
figana min dadxine li cîwarê!..

Ûy li minê ûy!.. w' ezê bîkîm bavo, dayê dayê!
Ûy li minê ûy!.. de w' ezê bêjim hal evhayê!..

"Jî dilê xwe ra çî bêjim" xwe bîbêm dayê
w' ezê wê çawa binîm saz û rayê?!
Em li ser rîya felekê biçîn, wê nedxwest,
çîbkîm ku min ne baldayê, ne guhdayê!!

Ûy li minê ûy!.. w' ezê bîkîm bavo, dayê dayê!
Ûy li minê ûy!.. de w' ezê bêjim hal evhayê!..

MENZİL (*)

Mij girtıye tava hêli,
bı awê laçık, bı awê xêli.
İro roja eceba ye,
danûstendın bın e jı hev,
bav-kûr hev ra bûne êli..

jı halê wan ra w'ez reben ım??

Baê ku rakır, baê geli,
jı darê weşand tayê guli.
Kê bihist gelo, kê bina ye
xortê mala xwe tırke dınya,
dayka xwe nekır lı pey xeli?..

dayka wılo ra w'ez reben ım!..

Qız xwûşk mın jı hafa jêli
gazi dıke bı dengêk êli.
«Kê dit dibê, xwe bina ye
soveberê av û behran,
bın behrê da xwe wezeli?!..

jı bılxatıyê ra w'ez reben ım!..»

Xwe lı ser rıya çift-çepeli,
aqıbet xwe lı me nekıre belli..
Em ne bawerê xew û xewnan,
xortêm menzıla xwe cıyeki dın,
dıçe ber bı xwe mezeli..

jı xortê xwe ra w'ez reben ım!..

EW ROJ

Ez û Ziya, xwe rûniştine l' ber çadırê,
hîmê germ e, hîm xeder e!
Bî axaftinê xwe dişon masi,
destê me da du hev kêr e..
Zarûk çûne bikevîn behrê,
ali me da ne keder e!..

Jî nişkava,
qîz xwûşkam dî me da derket,
dev da hebû şom xeber e..
Ne xûya ye AZAD ê me digot,
ewa du saet e lê digere.
Em hay ninbûn gelo eceb,
ew lî kû ye, lî kûder e?

Dî eviya da hebû peşkek,
xûya nekîr tê da xêr e.
Bav, jî destê xwe avêt kêrê
bî tîrs rabû, dev nagere!
Bî lez û bez êriş kîre xwe ser behrê,
çarali da lê bigere...
Û lî dîlêm xîst lîz û tîrsê,
wek dengî wî dîhat gazidîkîre:

«Lê lê Bilgo, lê lê
lê lê xweli serê rabe! rabe were!
Were binêr, Behra Spi, Fransayê
bî çî awayî bergehber e!..
AZAD ê te dî bîni da wezelandî
xweş(!) razaye.. dî halekî lal û ker e!..

Pêla behra xain dimeşe lı çarali,
govend digre lı ser sere..
Wi vedişêre bı ger û fen, bı zanayi,
eyba xwe jı ala kesk û sor û zer e...

Idi naêşin xortê te paşla xwe da,
şehid kırı lı ser qûmê û çaxıl e,
Der-dora xwe lı xwe xıç e,
hûr û girê hışk kevir e..

Rindi, rewşeni, aqılmendi lı pıştta xwe
gırêdayi wek kembere,
Xortê te xwe ninbû jê ra neyar-nexwaz,
nekır jı xwe ra yek hember e!..

Heya ku me kon danibû
lı ser ev mîlkê xopan lê lê Bilgo,
wiyê jı me ra kire sê sefere.
Rasthatını megere tu dı wê peşkê da,
bıbê ev me hukmê reş qeder e!..

Lê lê Bilgo! lê lê! de were bigri!
tu çıqas bigriy wê ewê bı te bıkebe.
Eyb û şerma te tunne dı giri da ,
hê sal-zeman jı-mın te ra neyêter e!..

Bigri Bilgo, xwe bigri, bigri!
lı ser AZAD ê xwe xweşik, welatparêz,
xwe badilhava çû heder e..
Xwe nebû ku jê ra neyar nexwaz,
jı xwe ra nekır yek hember e!.

DERKEVE

Derkeve ji behrê lao!
de rave ser xwe, de rave, rave!
Pis e, ava behrê necis e,
xwe pê meke heram e!
Va hêstrêm av û kani ji te ra,
te bî wan bişom, tefil kim,
dewsa av zemzemê, gulav e..

Derkeve ji behrê lao!
de rave ser xwe, de rave, rave!
Pûç meke qedera me,
lî ber av û derav e!
Potên te zûwa lî ber me,
wan bî hêstrên me şil meke,
wan neke av û delav e..

Derkeve ji behrê lao!
de rave ser xwe, de rave, rave!
Meşewtine dilê min,
meke xana xerabe..
Dayka te gazi ke xwey tunne,
xwe ne dê, nine bav e..

Derkeve ji behrê lao!
de rave ser xwe, de rave, rave!
Tu l' iqbala me binêre,
çî bê urt e, çî bêbav e..
Serê xwe dî me da derani
çî bêbexti kır lî me,
xwe j' me ra ani çî gav-e?!..

DIRÛV NADÊ

Dıkım nakım dengê xwe nayê,
lı mın dayê desta bıgırım, bı piya naye!
AZADê m nav sendokek da dırêj kırne,
dırûw nadê tabûtayê!..

Xwe lı textê seri asê mayê,
lı mın dayê porê xwe tê da xweş nexuyayê..
Xortê m nav etlasên wê da vezlandine,
tabût, lı bejin dırêjê mı nayê!..

Kulilk-çiçekên xwe lı dorayê,
lı mın dayê kêfa xwe ninın, bihna xwe nayê..
Xortê m işev berdıl-paşla wan da,
xwe bû malê.. xûbarayê!..

XWEZKA

Ew me germa hışkiya na,
dermanê dilê reşkiya na..
Dıbê m ji xwe ra lo mezelvano
xwezka ji xêra Xwedê ra na,
Jı xortê m ra mezel dikolandi
te ew dem û ew gavana,
Bê r û tevır dıfirandi te ji ber xwe dest,
ew ber bı te peşkiyana!
Mıl-baskên te bıketiyana ji te,
mıl- destên te bışkiyana!.

LÊ LÊ BÎLGO (*)

Evê hate serê te yê xerib,
ji te ra bes e!
Qismetê(!) ku di te da bari,
nayê serê heri kes-e!.
Karê xortan bû raxin govend û reqse,
evê te ji te ra dani derdê gran,
ku idi nese, lê lê Bilgo!..

Şên û şahi esman da hate xwarê,
cêv tije bûn, pey ra kise.
Te ji kulmên xwe danibû berê,
ser da qelibî xem û kesr-e..
Tu jê dûr diketiy, dilê te hûr hûr dibû
bî weswese.
Lî ser xortê xwe, tu dişikiny
xwe bî hesab û bî hendese..
lê lê Bilgo!..

Êvar dibû, guhên te li derî bû,
ku li zilê xe, pîr li ber nese,
Dikete hundur lêdixist bî sazê,
klamên Kurdistanê çî b' hevê-e!

Bî sitran û kêf bû, çîma ji oda wi nay,
idi ne deng, ne bibê hes e?
Dayka xwe ji, xwe l' ser vê demê mayi,
hê ser da dîstine xwe çî bihn e, çî nefes-e..
lê lê Bilgo!..

Rêwitiya xwe ya paşin dabû,
ku merv «de» be, pê nehise?
Xêrxwazek ji te ra nebê, kûrê were,
ser û çavê xortê xwe têr ramûse.
Devê xwe dayne ser gevriya kejik,
bûse meqetine li pey bûse!
Ew eyamen xatira ne, idi jê nastini
ne xeberek ne yek pîrs-e!
Ka idi xwe kingê digijyêy,
hebe mineccimek jê bîpîrse..
lê lê Bilgo!.

Va ez ji te ra dibêm: lê lê mekesire!
navê AZAD li Kurdistanê bûye behs-e.
Girin jê ra ne hewce ye,
bîla dilê te ewqas nehelise!
Lê belê êşa kezêbê ye, dayka şermi dîke
li pêş xerib, li xwe nas-e.
Ku mîrna bêîman dibe xortan,
ne dişewite, ne xwe j' kesi heyê tîrs-e!..
lê lê Bilgo!..

Lê lê Bilgo, felek xain e,
ku te ji xerek nedi, li serê mese!
Qet mebê ku AZAD ê te
orta PARÎSê da razaye, xwe bêkes e..
Kula KURDÎSTANê dî dil da maye,
wi germ dîke, wi dihelmêze,
Dayka wi ji bî vê kulê, bî vê kesrê,
hîm dibarine, hîm dînivise...
lê lê Bilgo!..

Dayka AZAD! Haydê rabe, êdi mese!..
şin lı ser xorta nay kîrnê, bike bese!!
Maqûlê te yê Kurdistanê
heznedîkır jı rojên reş-e!
Lê de waye, per û baskên te ji şıkestîne,
nema kesek xwe ji me ra kêf birêse?..
lê lê Bilgo!..

TE GOT

Xewna xwe mı dit lao, em lı Diyarbekr ın,
tu xwe lı nav dergê mın mala bavê.
çend hev heval xwe bı te ra dışevrine.
AZADo gotım, xwe nêzi te hatım,
ez lı ser te xortê xwe hûre hûr ım,
ew awê destar mın bihevriine.
Ew ım ku lı ser te digrim û dısıtırım,
dayka te nızane te tal dıke diêşine,
bıbêj mı ra ku xweşa te nay, te dıcegrine?
Te, te ew awırên xwe melûl lı ser mın gerand,
weki ew hestiyên mın bıderzine..
Xwe bı dengê xwe meyûs te jim ra got,
«Ağla annee!..» nivi Kurdi, nivi Tırki,
«Tu xwe bigri, bısitrine!..»

Ç A V O (*)

Heylo çavo, waye salan radixim ber te,
heri rojên pûç û aza ji hev biqetini!
AZADê m nava roke isalîn da tu nebini,
xwaziya xwe bî sala parin bine,
xezeb bîbarin lî mewata isalînê!..

Were çavo, ji tera bîbêm rasti, bîkîm gazinê,
ku neheqbîm hesabêm derxe
ser kaxîzê nivsandînê!

Par van çaxa xwe lî pêş te bû,
sala isalîn AZAD ê mî n ku nabini,
Xwaziya xwe ji mîrînê ra bine,
lenet bîbarin lî jiyana iroyînê!..

Çavo! oda xortêm hatiye girtin, hatiye radanê,
kes têda rûnanê, tê da nake xeberdanê!
Ji mehan vîr da livînê xwe raxisti l'erdê ye,
dayka xwe pê dixapine bî hatin û,
xwe ew carên tê da diket xew-razanê!

Çavo xwezîla tu hêsir dîmayî
lî ber derê bavê xwe Celadin ê,
Dîçûy-bîhatay lî ser gaz û girê Dûderya,
dî nav gevizik û kadinê..
Te nediyê AZAD ê xwe, warê bavê,
dî nav camekan da vezelandî,
Lî ser milên xwe hevalan..
hîs û nefes.. jê hatî bû xesandînê!..

BA

Baki hênik te ji ali xortê min,
dike xize xizi, nûze-nûzi,
Pê ra hene hinek gotin, hinek gazin,
hinek xeberên hışk, çelûzi..
Devêm digere li ser AZAD ê min,
xwe radizê li kêleka darke rizi,
Dibê: «çiqewimi li te, lê lê dayê?
sitûyê te li ser kê xwar e,
xwe çim a bûyi pişt qilûzi?!..»

Dibêm: «tu j' kû derketi baê bî kul,
wusa xeberdîdî bî dîzi-dîzi?
Nizam dirûv dîdî baê serwext, baê giran,
ya tu firfiroka gelewûz i?..
De bra xortêm canê xwe cahil bihelîne
li bin axa cemîdi, axa bûzi
W'ez ji birina dilê xwe pê bîkevinim..
bî kevîrên li serê hışk, girûzi?!..»

Baê rîndîk!
weki ku mêşa hingîw xwe d'çe ser kewarê,
tu bî bar i, diki vîze-vîzê.
Nizam bihna kijan gulê hîldîdî,
rabûy ji ser kijan ji nêrgîzê?
Lê weki hîlma AZADêmin li rûyêmin dîxi,
weki dîxi tu li min pozi,
Xortêm dayka xwe ra bihna xwe şandiye,
xwe tu şahed, qilawûz i..»

Baê nermik! ber bî xortêm bifetli,
hêdi here! neke xize-xizê!
Kerem bike, xwe bîde desta,
şûna namê da vi kaxizê!
Min ew her tişt nîvsandi, ew min tê da,
xwe bî tarix û bî rêze-rêzê,
Çi derbas bûbe ji iro vîrda,
ew ji me ew roja peşk bireşa oxîrsizê..

Xwe jê ra dibêm:
xortê minê hêmin, egit,
tu berêz i, welatparêz i,
Dîçim hinek der-ciyanan,
resmê te dalqandi dîbinim, melûl i,
lê ne bî kin i, ne bî xerez i!

Meqsed-mîrazên xorta berxêm,
dîpivî bî qentara,
nayn kîşandin bî terazi.
«Kurdîstana Azad» bû daxwazyaya te,
ku te ew dîdomand bî dîlxwazi.
Şîrê dayka te lî te helal lao!
Tu, lî vê dînê serbîlînd i,
xwe lî wê dînê.. serfiraz i!..

BIRAO.. BIRA

Gulê, Dijlê, Bijaro! lı mın bınêrn ê ra!
per û baskên xwe şıkestım,
Mıl-destên xwe ranabın,
ber bı esman, Xwedê ra..
Xwe hewar daxım lı hewarê,
lı behrê bıbarınım şor û qeda, nıfıra!
Çı heq-mafê te lı me xopanê behrê bêjım,
ev çı te kır bı me ra?
Te dê ji ewlad qetand, xortêm ji mırız û can,
bıra nehışti lı berpal, pıšta bıra!

Eman, eman, emanê,
felekê glorvanê!
Gelo ji kê ra bıhêli
evê ger, evê xanê?!..

Gulê, Dijlê, Bijaro! Hûn ji bêjn bı mınê ra!
Heyfa Xwedê, heyfa AZAD ê mın,
hewra ber devê çem û pıra,
Şewq û şemala mala bavê,
lı ser dilê daykê find û çıra!
Av çıkandê, tofan lê hatê behrê bejin,
xwe nemini lı hal-hazıra!
Ew te çıma ronıya me tefand gelo behrê,
te ew xıs bın temezıyên ewra?
Te nehışti lawêm bıratıya xwe bıke,
xwûşkên xwe têr jê ra bêjn
«AZADo kejo, xorto bıra!»

Eman, eman, emanê,
Felekê bêimanê!
Ka ji kê ra bihêli
qada xwe, xwe dewranê?

Gulo, Dico, Bijaro! Guh bîdîn bêjûm we ra:
Xwedê nedaye nade.. qûrban, boraq,
ne bî cotên qawîra..
Hûn xwe bendevanên bî salan,
xwe ra hatin ber av û behra.
Roa sîsiya we dit, behrê kîr qelaşî,
lî xortêm gerand çî ger-fenên kafîra?!
Jî xwe va, hûn hatûbûn wê zalîmîstanê,
we jê bîstenda piçeki kêf,
lê bîxwara gef û gûra(!)

Eman, eman, emanê,
felekê çîrokvanê!
Ew lî ser xortan dîgerin
çerx lî xwe bê îmanê?!..

Gulo, Dico, Bijaro şaş nebin halê mî ra!
AZAD ÇINARO nakim, dev nagerim ez xwe ra..
Xwe hûn werin.. bangbîkîn,
qêrînkî BIRAooo!.. BIRA!..
Lê deng bîkî BIRAO!.. BIRA!..
gazîkî BIRAooo!..BIRA!..
Derdê bêkes bûnê, şerbeta xûrbetê jî lî nav xîm,
dabîkî dîqîrka mî da, dayka xwe bîzûrînin..
ew berxa wek ber devê gura!..

Eman, eman, emanê,
felek dixê lî elbanê!
Ka kê ewil top dike,
xwe lî bîn axa selxanê?

Gulo, Dico, Bijaro! Biraο bıkın, xwe bêjın!
Kul-birinên dilê xwe

te dest-derman pê nekır.

Xwe bî awırên şirin çavên xwe,
te dinya felek nasnekır.

Te b' şıkıl-şemala xortanya xwe,
qe mıraz nestend, tamnekır.

Ew hesret daxwazya welatê xwe
te hışti.. tu çûy kûderê Biraα?..

Te tirên ku, tu avêti dilên me,
ki derxe, ki me bimarke bra?

Tu, nebiyê Şex Celâl Begê Dûderi,
Suleymanê Eshed Begê Şırnasi..

Tu AZAD ÇINAR ê lawê Bilge-Ziya,
ma qey bê esl, bê ûrtê wûsa,

Xwe tırka dê û bavê xwe bıke,
qe ji wan nexwaze xatıra?!"

Ax lî me kul gırano lao!
ax lî me mal nexırabo Bira!!

Birehmo, tu bî insafo, ma ne tu xaino,
ma te daxkır dilê xwe daykê,
ma te zık lê qelaştο bira!..

Felek eman, emanê,
Em pez in, tu berivanê..
Ka bî kê dıdi xwarınê,
mast teze, xwe şir danê ?

ŞEWITÎ MAL



Ew gava fetlim, xwe gihiştım malê,
mal şewiti hat jı mı ra,

xwe bûye xırbê heftê salê..

Ketım nav, çarali xortê xwe tê da geriyam,
lı mın xûya nekır ne cısmê xwe..

ne l' mın giyanê... ne xıyalê!..

Bêtebat bûm, wext derbas nekırım tê da,
gav dırêj bûn, weki bubhêrım salê..

Rabûm lı ser xwe pê û lınga,

xwe avêtım ser newala ber qenalê.

Ewku mı dit dengê wan tê, qenal dıbêje,

newal digri bı nale nalê!.

Megrin qenalê mı got, menaline xwe newalê,

bes mın xwe ra hesab bıke,

wek hınkûfek, wek hevalê!..

Xwe sebra xwe naym lı derva-hûndûrê malê,

xwe tê mın dengê bûma kor telalê..

Xortêm ji ser xwe peya kırı dıbê

jiyan.. xwe bı hırına hespê falê..

Ez xwe bavêm kûderê, de tu bıbêj!

xwe l' çolê xım, lı çı xewnê, çı xıyalê?

Lê lê go, devê xwe vekır jim ra qenalê,

go, çıma ser me da hati, çı dıxwazi

ji me bı wi giri bı hale-halê?

Xwe here kula birêje ser mezelan,

nexş xemla xwe, bı gulên alê!..

Xortê te peyayê wêder, here binêr!
xwe bî halê, ya bêhalê?!...»

Bî rêketim, canê mî xortê mî fida, lê helalê,
lê ne mî xwe qewet mî,
çokên xwe da ne mecalê.

Ketim nav mezelan ku, ne gul mî, ne jî alê,
gul, şûna wan da xwe rabûnê
giyayê hêşin, kûspê tal ê..

Çav bî mî ket, pîrskîr vê car giyayê,
çima jî hevçûme awê çewal,
ezê çima bê pergâlê?

Ma têm jî serê kîjan deşt u çiya,
nêz mî, dûr mî jî şengalê?

Xwe qûrban mî giya gotim , giya talê,
xwe j' mî sûal meke
w'ez çî hal mî, çî hewalê.

Xortê mî peyayê vîr dibêjî,
xwe rê bîde mî bîçme balê!

Ez bêriya por wî ke jî mî,
bejna zîrav, mî xwe cînsê bav û kalê !

Here wê gö, ew hesreta xwe j' gele malê,
dixwaze jê ra hînek binî
xebera xweş, qale-qalê."

Biyani yek jî ew e dî nava me da,
lê naxwaze ne çalîmê.. ne çîqalê!.."

Awê ku got, ber bî xortê xwe lezandîm,
ber bî berxê xwe, xwe berxê salê,
zeman çûye ka anibe lê çî halê

Mı dit kaniya navbera me.. dıke yale-yalê!
rê nade ku bıbhurım,
şıldıke lı mın sol-şekalê..
Dıpirse çı dıkım, çı dıgerım xwe l' vır,
lı vi bajarê çax û salê?
Ez xwe tê da wunda nekım,
ev ne me diyarê bav û kalê!..

Kaniyê delalê, gotım jê ra,
deng bılûrê, deng qewalê!
Çav lı Qıblê, lı Başûrê dınêri,
av dıdı Bakûrê, şımalê.
Dıbên, xortêm qeşeng birçi lı vır,
kul-kesra mın zewade jê ra,
tu veke rıya mın hemalê!.

"Jı ser ÇINARê te tê" go kaniyê,
"guh bıde dengê şalûlê
xwe çı zizê, çı melalê!..
Jı beranê te ra dıbêje, dılorine,
hım fesihê, hım zelalê!..
Xortê te, xwe dı xewa kûr da ye razayê
bı klam-stranên wê delalê!..

Hatına te tewş e, bı mın beradayı,
xwe bıçi balêê.. neçi balê,
Ev bajarê zık têra ye, bédenga ye,
evi bajar.. ker.. û lalê!..»
Lê mın çı got? çı hat lı te, lê rebenê?
Weki xwe keti jı serê çiyayê Nemrûd,
jı serê çiyayê Sipanê,
Weki her weslên te, xwe wundabûn ,
dı nav sıtiri-dırı; xar û sincê gûrê dalê...»

A W A Z

Jî şevêk zıvıstanê ye işev..
serê çille, paşiya payizê.
Ba û baran ketine eks û nika hev,
bı xışim û bı xize-xizê.
Herkes dı xew da, kes nemay bê xew,
ro lı ber şerq-roniya sıbê,
wex awêtna gelavêja gundûz ê..

Xewa xwe nehatim disa işev,
weki ku ney xewa dıza erezê.
Serma derva hışê mın lı ser,
dilê mın pırte-pırtê, zize-zizê..
Dı nav livinên hışkê kevir da
xortêm zeifo, ne xûrtê qelew,
Serma Kanûnê lê dixê(!) dıbêm,
dıcemıde, were ku dilerizê(!)...
De mirata xeribiyê ye têhew!..
de nızanım ez ji nebım,
wê ki lı serê bışewıte, bılerizê?!..

Weki rûniştım lı ciyek.. tew û tew!
ne birê, ne tunelê, ne dehlizê..
Çav AZAD ê xw dikevım, lê bang dıkım,
lı ÇINAR vedıgerinım,
nefes lı mın xize-xizê..
Lê xortêm bersiv nade,
lı xwe venake dev,
nıya xwe ji mın dıguhêzê!..

Qerin-nalinên mın naçinê, tê hew!
bımırım ez, nemın ım dayê,
AZAD dengê dayka xwe.. nabıhizê!!

Bı wê wehcê.. hıldıdım destê xwe kaxez,
kaxez bı çixêz-çixêz, bı rêze-rêzê.
Dıdım bın derbên qelem û nıvis,
awê ku bıkujim rawır û kêzê..
Xwe de pê ra ji awazek tê guhê mın,
weki AZAD ê mın e, dıxe lı sazê,
pêçiyên xwe lı ser dıleyizê..

Lêdixe û dengê xwe jim ra dibê:
"Dımırın Walle disa ter û can,
dımırın pir û kal,
xwe ê pıšta xwe qılûzê!!"
Emır xwe l' ser cıhanan naqetine,
nû lı xwe nake, kevn naguhêzê!..

ÎRO ÇENDE

Îro çend e gelo gidino?

Meh e.. sal e.. dem-sal e,
hundirê xwe da nabim sayi!..
Ewrek giran girti min nav dîl,
ne roni yê, ne şewq e;
ne sir lê, ne lê bayi!

Îro çend e gelo dîşewitîm?..

bûm dîzika ser agirê,
peşka avê tê nemayi!

Îro çend e gelo,

jî xortêrn dernay deng-e,
jî feleka xwe, xwe bêhayî?..
Hêla dinyê xwe bî nexş e, reng e,
wi lî kijan quncîk xwe daye alî ?

Xwe AZAD ê min gelo

lî ser çî asteng, rîya teng e?
lî çî pûk-bagerê asê mayî?
Xwe çî hat seri, lo gidino,
xortê min... dî me da dernay?..
xwe îro çend e ?..
ne bî suwarî.. ne peyayî!!!..

BİNÊ PİRÊ

Lı binê pîrê, lı binê pîrê,
AZADê m şofêrê ser şekîrê..
Xwe erebê da dıbir-tani,
dîlê daykê nedcebirê!

Lı binê pîrê, lı binê pîrê,
motor-erebe tîn-dubhurê!
Ya xortê m bê xweyi mayi,
lı qûncık tari nasîtrê!..

Lı binê pîrê, lı binê pîrê,
dînêre, dînêre û dîkesîrê!
Ereba xortê m lı xwey digere,
de dîlo were tu bıcebirê...

...T Î ...T Î ..

Tu nızani lolo lao, te nekşandi
evê zîlmê, ev zîlmeti, tu dıbhizi
xwe nızani xwe l' ser çok i, çı qeweti..
Ew tu «do» bı kêf û derdê wan ra, hê tu «do»,
xwe te heval, hemraz bı taybeti..
Ew lı ser navê te «iro» ji te ra kırın
lituf, kerem û hurmeti,
Ew «iro» gûhartın te ew herdu navê te xweş,
lı te danin ku «Rehmeti»..
Ez ezberkım, dıbêjin ji ku ji mın ra...
xwe ne l' xeydê xım... ne l' xeybeti!..

XEBERA İRO

Lao bêjim AZADo,
tu zani çı xeber lı me iro?
Xatiya te kurê xwe JEHATo
meha te l' me nebû heft,
tırka me kır jı nişkava!
wi ji, xwe ji me kire dûr..

Ber bı bajarê te ew bı rê ket,
bû rêwiyê ber bı te va!
Lı dinya mırat ew jı me ra ket
du hev mezel xwe gêncê û hûr..

Pêşi girin e, paşi zılnet,
jı qırka me birri hewa!
Xwedê ku nade, nade lao,
me tam nekır pıçek hıızûr!
jiyana pey wê, xwe kır me ra,
me neyara lêxın bı şûr!

NEÇİR VAN

Lê Taliê, lê lê xwûşkê,
ev çı qeder bû, me l' dû xwe hıştê?
Şax û guli qetıyan jı me,
em man lı ser xwe du dar hışkê!..

Yek seri pırpızêk bû yê te xwangê,
yê mın lı ser mêrgan zer kerengê!
AZAD, JEHATan me mezınkır,
xıst paşıla qûl bı zengê...

Lê lê xwangê, lê lê xwuşkê!
xwe herdu lı ber me, lı ber enişkê.
Ew çı zalım nêçirvan bû,
xıst lı herduyan wek kerûşkê?..

* * * *

K Û R Ê

Lê lê xwangê, lê lê kûrê,
were rûnê lı ser devê çar rê..
Jı gelan-gidenan de bıpirse,
kê dit xwe kula lawê, kula kurê..

Lê lê xwangê, lê lê kûrê
nıfirke lı bextê me serxûrê!
Lı ser serê me feleka xwe dani,
jı me sıtend me cotê kûrê.

Lê lê xwangê, xwe lê lê kûrê,
me bapirê xwe Dayka Dûrrê!
Bı nebi-nebiyanan wê miraz dit,
me ji weşart kûr lı pey kûrê..

Taliê xwangê, lê lê kûrê
mırın bê imanê, dıl gûrgûrê.
Çavê xwe lı lawina gerand,
jı dinyê revand me herdu kûr-ê!..

MELORÎNE

Megri xwûşkam, melorine,
hêstirê şorik mebarine!
Xwe l' ser lawê zizê, tenik,
tenik tenik mezarine..

Megri xwangê, melorine
giri, lı meriv dıl dıxrine!
Eşa me herdu cotê lawan
bê derman e, xwe nabrine!..

Megri xwûşkam, melorine
agirê dılê xwe daxmexine!
Xwe bala xwe bıde mın gulyê Çınar,
baê xwe lı ser xwe "nû mezel"an
çıqas narın xwe dilorine!..

Megri xwangê melorine,
pê sax naki xwe bırine!..
Jı dılê me ra xwe melhem e,
xwe l' pey xortê xwe em zanıbın
emê ji xwe kingê seferi ne..

DIKOLÎNE

Xwe bêra desta dıbarine,
kevır, xweli dıxılorine!
Mezelvano jı xwûşka mı ra
mezelê lawkê xwe dikoline!..

Xwûşkam digri, dılorine,
davê hêstirk xılorine..
Gazın bıke jı mezelvano,
xwe dev-zman nagerine!.

Bıbê mezelçıyo, mezelvano!
jı bextê me ra bê vıjdano!
Bê jı mezelê xorteki tu têr nebûy,
dikolini ma tu ewê duduyano?..

Mezelçıyo, kefs girano,
bı tevrê destê tûj dirano,
Bê çawa dest-milê xwe tu dıçûy,
bıkoli jı xortê me ran mezelano?!..

TE JI MIN ÇI XWEST

Lê felekê şika bibê, te ji min çî xwest?!
Ma qey xızna bavê te bêrika mı da,
ew mın hılda jı ber çav-dest?
Ya dagırtım axa te wêranê mı qey,
lı mın koşk û seray, xana gulgeşt?
De şika bibê tu felekê,
ez çî hebûm?.. te j' mın dıxwest?

Ez eva keys- gava bûm..
te jı mın dıxwest?

Lê felekê şika bibê, te jı mın çî xwest?!
Ma qey ceneta te bın piyê mın da,
mın emel nekır bı zevi, serdeşt?
Ya jı wexwarım Şeraba te Xelilê,
çûm jı serê xwe, bûm serguzeşt?
De şika bibê tu felekê!
mın çî wexwaar?.. te j' mın çî xwest?

Ez eva firsenda bûm..
te jı mın dıxwest?

Lê felekê şika bibê, te jı mın çî xwest?!
Mın çî girt jı te, jı te sitend,
jı zaryên xwe wêda, xwe ra bı dest?
Ew jı xwe gırtiyên xeribiyê,
dıxwûn loq û keda bındest..

Ka şıka bîbê de felekê!

mı çı girt jı te.. te j' mın çı xwest?

Ez eva rık, heyfa bûm..

te jı mın dıxwest?..

Lê felekê şıka bîbê, te jı mın çı xwest?!

Tu xortê m lı ser ewra dıgerını,

nav pembûyê sıpi, berhemên deşt?

Ya, te dit xwe ronedi, xêrnedi ye,

ferz bû bı mırnê ra bikeve geşt?

Ka şıka bîbê de felekê!

ew te çı da ber lawê mın?.. te jê ra çı xwest?

Te çı dani ber xortê mın..

te jê ra çı xwest?

Lê felekê şıka bîbê, te jı mın çı xwest?!

Çı vır-nevi kır mın lı te , mın çı derew,

xwe heq kırım, bışkêm mıl-dest?!..

Ma qey din-imanê xwe, ne ewê heq bûm,

tu xas İslam, ez xwe Zerdest?

Ka şıka bîbê de felekê,

xwe çı ol-mezheb bûy ew.. te jı mın dıxwest?

Te dest-çokê mın şıkand, te felekê..

te jı mın çı xest,

te jı lawê mın çı xwest?

H Û N

Lao

Li respê te dinêrim.. ser û çav lihevçûne,
hım ji xweş, hım ji xoş in,
Lê nêrtinên te melûl in, mehzûn,
lê zelûl in, ew meyxwoş in.
Xwe weki gazinên xwe dıkin li mın,
li mın gêjika xwe serxoş ım,
Çava nızanbûm ew te malên emanet in,
wê ê ji mırnek her zûtır ra xwe bıfroşım!.

Ji keję xwe ra w'ez qurban ım!
Demên dinya derewin wext bıwext, roj bı roj in,
Herkesê dıdın pêşiya xwe dıbin, nanhêrin
bıxêr in, bıkêr; beradayi, ya ku boş in..
Zeman bêjınga qûl e.. em teneyên genım li ser,
yeko yeko ber bı bını va dıçın,
demên buhrin ra em ji... dıhiloşım!..

Ez xwe nemamo lao
ber we dıkevım ku **hûn zû çûn**..
ez xwe bı wi derdi ser nexweş ım!
Dıkım nakım safi nabe,
xwe bı wê êşê dıl xwin reş ım..
Lê teseliya mın ev e, ku hûn welatparêz
sitûnên azadiya Kurdistan, kelên welat in,
HÛN xwe nav-emelên xwe wundanabin,
bı baên tên-dıçın ra **HÛN**
helnaweşın.. nahıloşım!..

DİGRİ LAO (*)

Kezi kezi kul vedigre,
digri lao, daykê digri!
Pêçi lı ser, dev heldıgre,
dıřêj dıke pê da dıgrê!..

Bısk û guli dihelısine,
digri lao, daykê digri!
Kula kevir naderızine,
dı dıl da ye, tê da dıgrı!..

Kete dewsa hıřkê zıbıl,
digri lao, daykê digri!
Ser-sinçê te dernay jı dıl,
dıde pêş xwe pê da dıgrı!..

Te xwe da gotın, wê nıvisi,
digri lao, daykê digri!
xwe girêdaya wi werisi,
pê kaş dıbe, pê ra digri!..

Tu ev soweberê mina masi
dıbê lao, daykê digri!
Qey ewê ku behrê da bıfetısi,
dıbê Bilgo "lao!" digri!..

EMÊ JÎ HERIN

Me dıgo lao, emê ji herin xwe bavêjn
ser ax û xeliya welatê,
Guhê xwe bîdın dılgir û hesretliyan,
xwuşe-xwuşê çemê Dijle yê,
gurmina dengê Feratê..
Bınêrın jî ber çî ye ev axin-zarinên wan,
dî nav hev da ew dıkın qala
çî zılmê, çî kêferatê?

Emê ji piçek av lî şewata wan kın, karıbın
bıkıne dılên wan tewatê.
Helbıdın jî ser singên wan piçek aran,
bıdın ser pişt û milên xwe
hazır lî benda xebatê..
Me ne go tu şehid, em jî hev qetiyên wusa,
xwe em bımının lî biyanê,
şewat daxkın bî şewatê!..

Te xana dılêm jî bımı da şewıtand lao!
kır xırbê hesretê, qesewatê.
Bû ew dara rût payiza paşın-zıvıstan,
lî berfê, qeşayê lefiyayê,
xışına pelan jê nehatê!..

Mı go xortêm,
hemın mırazên te nedçûn seri, ber te dı man,
yek carek jî, te xwe bıdityay qey çıdbû,
xwe l' bın si û dar û berê me welatê!..

Ez rebena dilê te temiz, rûyê te nermik lao
ew lı te rûyê dergûşê, qimatê..
Ez rebena esaleta te, rabûna te-rûniştın,
te waqûrê xwe yê siyasi,
nişana civinê, civatê
Bêy te heram e dinya lao, gaziyam mırın ,
bê, destê xwe lı canê mın bide,
sarbike.. ev te şewata mın miratê!..

* * * *

BADE BADE (*)

Bade lao, bade!.. de bade, bade!
jı xwe ra ri-simêlê kej bade!
Sıba te nay, tu xwe nagini dusba,
wan ew iro bı hêrs, tu bı lez bade!

Bade lao! bade!..de bade, bade!
şal xwe ke û pışt lê bade!..
Şar-egalê ji lı serê xwe bilefin,
çav bışkên û awır bade!..

Bade lao, bade! de bade, bade!
desmalê lı ser dest, tılı bade!
Xwe dı "Delilo" yê da bihêjn,
çok bışkên û sermıl bade!..

Dade lao, dade!.. de dade! dade!
dilanek bıkef û bıdıl dade!
Ala rengin û lı canê xwe bilefin,
bade, wê l' ser sing, serdıl bade!

Bade lao, bade!..de bade! bade!
tızbiyê bı bend û qeydê bade!..
Ez bîjmêrım, hebo hebo tu bıqşın,
bınêrım ma lı te çendê wade?..

Rade lao, rade!.. de rade! rade!
deri, dergê xwe gışt, tevi rade!..
Felek lı ser te qewl û qırarê xwe dani,
xwe bı geflên hışk, qewi rade!..

Nade lao, nade.. de nade, nade,
felek bı zêrê çılçıl nade!..
Dora mın bı sûra rûhayê gırti,
xwe l' mın rê, gêçit nade!..

Nade lao, nade!.. de nade, nade,
kevır bı mı ra xeber nade!
Jı xwe va têm ez xortê xwe bıbinım,
gor tofan te nişan nade!..

Dad e lao dad e.. çı dad e, dad e?
çı hıqûq e, çı edalet e, çı dad e?!..
Felek bubhêr bra fêlbaz-xırwebaz,
bra rade lı ser te, jinê û jıyan dade!..

* * * *

Dıl bı kul e, bı qesewad e,
lê dayka xortêm ne fesad e..
Bıçe kûderê ci dıdınê,
ji ber ew dayka AZAD e...

GAZA SÊMİKÊ

Lo lo lao, Gaza Sêmikê, lı binya kelê,
kaş lê hewraz, jim ra dıhate tik-e,
Sûvarên Dûderi lı ser rıya wê teng, xwe cirid bûn,
xema xwe ninbûn, ne j' ketinê, ne j' talûke..

Me bêbexta felekê lao, ewliya ewıl
serê xortê te gerdenezero dani, lı mirata xûrbetê,
Nızanım dapir-kalanê te ciyên xwe da dısıtırın,
lo gelo berê tirbên xwe nefetlandine
ber bı qebristana te entike?..

ÇIMA

Xwezi bı meha Adarê, lı geliyên geli,
berfê jor da lêkır, jêr da heli.
Jı dem êvarê ra nehişt avşeloka şêlû mêlû .

W'ez lı dayka AZADê xwe bıbarınım,
bêjing bıkim seri da xweli,
Şewata xortê mın, hesti biheline de bra,
lê ku mın goştê canê pê neheli!
Qeda lı mayına mın der û dınya wusa bê bra,
bê çıma ji nav hundurê dilê mın dernay
bejn û kêrsıma te xortê mın çav surmeli..

H I S A T E N A Y

Ava bûye, xerab bûye,
ji hev çûye, terab bûye
Dinya te hişt ne xema dê,
xwe hîsa wê tê, eva Te nay...

Xwe şewiti, kebab bûye,
perçe perçe belav bûye
Jana lê hat zîrav bûye
ne xema dê, hîsa Te nay...

Xwe zivîstan, bîhar bûye
gul vekîrî xwe al bûye,
Lî ser, lî bîn ev ax bûye
ne xema dê, ku hîsa Te nay...

Xwe dengê Azan, çana bûye,
xweyê qesr û xana bûye,
Xwe nedit loqa nana bûye
ne xema dê lao... hîsa Te nay...

DILÊ ŞIKESTÎ

Tu ji goşt i dilo, ne ji hesti,
lê çima wilo hûr i, wilo west i?
Me dil nedit wusa hûrbe,
bibe toza cam şikesti..

B1 giri-kelegiri qe mede bersiv
tu rabe hilde kevgir û heştiv
Ev toz rake ji ber min , tu keremke,
bike nav qûtiyek ji zêr be, ji zivax

Ev iş bo te xûsûsi dilo, xasma xexsi
xwe hesêb meke, te kırım hepsi!
De toza xwe derxe, vîcar ji qetêke,
weki li ser sêni, li ser tepsi..

Ez kula xwe jê ra star, semsi
xwe tu toza xwe şilnebi, nehelmisi.
Ew tu hêdi hêdi li ser AZAD em werke,
ku ji bayê pêştir kesi nedit..
pê nehisi!..

Xwe dengê pa-patîna serpa şibana ma hewê
weki dîlîna şivana û dewrê ma
Xizîna û zîna ku ji wan derê
tu dibêyê xwe çî dikî ma çî derê ma
Dibêma gelo ew ku li ser xortên dîm-tên
dengê xwe vîna pîrana vîna dîlî ma

NEMİNİM

Ji aqlê xwe bûme lao,
ez lı ser te bırastı gêj im,
Çı hebûm bı tevayi mı qedand,
tışt nemam xwe ser kaxezan bêjım.
Her ew ım destê xwe lı canê xwe dirêjım,
Dıbêm, ku tenê dibêm:
Neminım lao!.. ez neminım!
neminım lao!.. neminım!..

Çıvikên serê şerqa sıbanan, ezê lao
pûrtık zer ın, qemçık dirêj ın,
Tê teqına dev û nıkûlê wan,
ji xwe ra qalıştên dara dımêjın!..
Xwe pê ra ji kêfa xwe dıkın,
çikeçık a wan e, ew klaman dıbêjın,
Lê weki ji dilê mın hûr bıkın,
wê j' nav ortê da bıqelêş ın!
De bra dibêm, bı dengê çıvikan,
ez heşyara xwe çiyê germ bım,
Xortêm, lihêf-balgivê(!) xwe hışkê gewr,
lıvinê(!) xwe derbejêri,
ji kevirê gewrê bêj bın!..

Neminım lao!.. ez neminım!
neminım lao!.. neminım!..

Xwe dengê ba-barana şerqa sıban, mın hewaro,
weki bılûra şıvan û dewrêş ın;
Xizin û axına ku ji wan dertê,
tu dibêy, xwe çı bı kul ın, çı dertkêş ın!
Dıbêm gelo, ew ku l' ser xortêm dıçın-tên,
dengê xwe vıha bıjanın, vıha bıtırêj ın?

Ew lorinên dayka wi serê siba ne l' ser
xwe carna hêdi hêdi, carna bı hêstrên
gûrin e.. xwe ku jê ra dibêjin?!

Neminim lao!.. neminim!
neminim lao!.. neminim!

X A Y I Z E

Lao, te mala xwe xeyidandi,
xamûş e.. xebernade.
dîlê xwe ji me bûye ziz e.
Dem bıhar e, dem havin e,
wê pel weşandi,
hati ser da.. lê payiz e!..

Te baê şinê lı wê lefandi,
ne deng e jê, ne lê reng e
ne zane pis e, ya temiz e!..
Dem çinin e, dem danine,
wê mıl şikandi,
nagre qevda .. belaziz e!..

Me xortê wê kû da şandi?
dıpırse ji me
"Menzil Şam e, Kerkûk e,
Diyarbakır, ya Tebriz e?!"
Dem girin e, dem zarin e,
wê xwe me acızandi
"Heşyar e ?" dibêje, " gêj e ?"
xwe mayi xew da?.. ya.. Xayiz e?!.."

HUZUN

Ne hewce me ji xwe ra xem bigerim,
navê xwe derxîm "xemguzin-e,
Navê deftera xwe bîm ku hîzûn,
qelem jim ra bînvîs xem-huzûn-e.

Mamosta xwe bîm diya huznê,
ders bîde mîn bîxemline bî huzun-e,
Ez mekteba huznê da ku bîxwinim,
jê nekîrîbîm xwe mezûn-e..

Gîran e lao derdê xortê bîjarti,
xortê qeşengê guzin e,
Te dîke sowebela behra huznê,
û lî te dîbarine ku huzûn-e..

Dayka te êşên gelek tal tamkîr lao,
talên ku naçîn jî qîrkê, jî xuzî-ne,
Ew êşên ku derketna wan jî dîl,
ne wekî hatîna wan zû bî zû ne.
Lê ku tama xwe şîrin tîn, ew je ra iro,
lî ber êşa te, ew jê ra bûne
meşlûr, şaranên.. bî gezû ne...

DIÇE

Xwe bigri-negri ji xwe ji hêç e
ne deng e jê, ne jê rêç e..
Bı kul û derdê nêçe-nêçe
diçe emrê dayka te lao,
dîlê xwe da bı wan ra diçe.

Ji qewli Tırka "sêçe sêçe"
ku mırın dibê xort û keçe..
Kula bextê wan xwe l' «dê» dipêçe
diçe emrê dayka te lao,
kula te lı xwe pêçay diçe..

Canê heyfên nêçe nêçe
lı ba mırınê ku rîşkên kêçe..
Ku «dê» dihêle, xwe bı law ra diçe
diçe emrê dayka te lao,
lê nızani çawa diçe?!..

Vır da diçe, wê da diçe,
rê nabine pê da bıçe,
Lı xwe giran, bûye kulçe,
Diçe emrê dayka te lao
helgirtı ev bar ra diçe..

Pêşva dixwaze, paş va diçe,
hak digere, bı laş va diçe..
Keti rıya şaş va diçe
Diçe emrê dayka te lao,
xwe bı "ax" girtı, "zar" ra diçe!..

QÛRTIK HESRET

Sıstke lao gemê derda,
daykê te bibin dem dı xew da..
Ev şerbet pêwerke ser da
derxe jı dil.. naxwaze pır..
hema qûrtık.. qûrtık hesret!..

Meyine birê tu dı mezel da,
bes jıbir ke heyf û merda
Axa reş e dı bin û ser da
derxe jı dil.. naxwaze pır..
hema nıqtık.. nıqtık hesret!..

Loqa nanê ma dı ber da,
xûlqa xwe nay nav keder da
Zari dıke, were d' xewn da
derxe jı dil.. naxwaze pır..
hema mıstıkık.. mıstıkık hesret!..

B I R E S E (*)

Birêse dilo, xwe birêse, birês,
teşiyê hilde, tu kula xwe birês!
Derdê dilê xwe ra bibê ew **perû ye**,
diyari ye ji xortê min,
ew jim ra birês!..

Birêse dilo, ew birêse, birês!

Birêse dilo, xwe birêse birês,
xêrnediyê dilo tu êşa xwe birês!
Elema dilê xwe ra bibê ew **şabaş e**,
hediya ye ji xortê min
ew jim ra birês!..

Birêse dilo, ew birêse, birês!

Birêse dilo, xwe birêse birês,
xeyberiyê dilo tu jana xwe birês!
Arana xwe ra bibê ew **yadigar e**,
xatira ye ji AZAD êm ,
ew jim ra birês!

Birêse dilo, ew birêse, birês!

ÇEP Û RASTÊ

Lo AZADÊ min, dibên.. ku mırın
leqay xortê qenc, ciwan-germas tê,
Bihna xwe ji wan ra mina gula sor
ji baxçe xas tê..

Ew baxçê ku xwe tu ji beşdar bûy dı nav da
serpısta xwe didi kê, tu bıde,
Lê qûrbana xortê xwe dibûmo ez,
tu ji dayka xwe ra bihêli
Hêla ber pêsira xwe,
û xwe herdu şeqay kezeba xwe
te çep û rastê!..

* * * *

ÇEME ŞİRNASÊ

Lê lı minê Çemê Şirnasê, guliyên biyê,
holık holık ser da xwûz e,
Hıjdê Tebaxê hıva xwe jor da dıkenine,
lı xwe kêf û cejna yek Newroz e..

Xortêm hewara xwe rabûye ser da işev,
Çemê Şirnasê lı xwe bûyê şaş-e..
Xwe nızane lı min-wê hati ev çı çax e?
Xwe wexta şın e-giri.. rez e-tiri,
ya l' me dem dawşandına beiv.. gûz-e ..

LE LE (*)

Dayka AZAD ê min lê lê
dev berdayi ji ger-gêlê.
Baê xortê xwe jê weşand,,
çok lê neman bikulê..

Dayka AZAD ê min lê lê
şewata nava ser dilê,
Kevir, bî kevirî sor dîke
weki nanê ser sêlê..

Dayka AZAD ê min lê lê
bazê xwe firand ji hêlê.
Me felek bêbav hukmê wê
refikê teyra boş bihêlê..

Dayka AZAD ê min lê lê
ji exsa feleka wê dêlê,
Mırin ji **mırnê** ra bihata
ji heyfan ra dibya berdêlê..

Dayka AZAD ê min lê lê
zivîstan bî xortê xwe ne b' dilê,
nızan bûm mırna wi ji mı ra
bexşişa(!) xwe germê- qêlê!..

Dayka AZAD ê min lê lê
ew deman bîbirtinê,

Xortêm singa xwe sor kirye
bı pêçiyân ketyê dıxwrinê!..

Dayka AZAD ê min lê lê,
lı pêş çav xwe dibe-tine,
Xortêm ji xwe ra badîde
xwe ketiye nava sımêlê..

Dayka AZAD ê min lê lê
guhê xwe lı deri, lı ser zilê,
Wexta hatina xortê xwe,
tê bihna xwuydana lê...

Dayka AZAD ê min lê lê
bı hesret, bêriya ew demê,
Xortêm lı saza xwe dıxe
radıke dengê kef-xêmê...

Dayka AZAD ê min lê lê
xwe lı xwe nedit dewranê,
Lı pey xortê xwe heram bû,
demay xwe kêf û seyranê...

Dayka AZAD ê min lê lê
jana xwe jê ra reberê;
Xwe ji xortê xwe dır naxe,
serê xwe dani ser ew rê..

Dayka AZAD ê min lê lê
rê nabine, jê derê.
xortê xwe lı wê, xwe lı vir
ki dı kê da gelo wê derê!...

Dayka AZAD ê min lê lê
xwar e singa xwe l' berê.
Pey xortê xwe rast nabe
xwari xwe derba xençerê...

Dayka AZAD ê min lê lê
nastine bihna tu gulê.
gulyê Çınarê xwe jê qetiyay
revandi ji ser xwe bılbulê...

Dayka AZAD ê min lê lê
" dê " nebhizin belav bûye xeberê.
Xortê xwe ji jiyana xwe dûr çûye
çav xwe girti, xwe dev-zıman nagerê...

Dayka AZAD ê min lê lê
gotin naçin xwe hişê wê , xwe seri.
Lı hêvya xortê xwe dîsekne
wê şîrê wexta bixe wê lı deri...

Dayka AZAD ê min lê lê
qêrin naçin xwe Xûda yê kamilê.
Xwe el-eman ji desta
jê ra birri emrê dirêj, zalimê...

Dayka AZAD ê min lê lê
xortêm dirêj, emır kınê, xawênê,
Havin buhart, payiz, xwe l' daykê
bejin kınan, emrê xwe dirêj davênê!!...

Dayka AZAD ê mın lê lê
mebê ew sûcê rûyê dînê, dehrê,
Derdê xortê te eslê xwe derya
xwe dertê ji ava yek behrê...

Dayka AZAD ê mın lê lê
sal dudu ye, ketiye sala sîsya yê,
Xortê m derdê xwe av naçkin
gîştîye kaniya kula ye...

Dayka AZAD ê mın lê lê
şina dîla bî dîlxweşa nexweşê,
Leqay te bê, ber dîguhêze
xwe dî rîya xweş da dimeşê..

Dayka AZAD ê mın lê lê
seyran dîke hawîrdorê, hawêrê,
Xort û cîwan dî geştê da geşt dîkîn,
"bihranin" paşê ra, heyfê xwe bûye yaverê!..

Dayka AZAD ê mın lê lê
dost megere tu lî dora xwe gomê
Ağır xwe cîye xwe dîşewtîne
bes bra l' te nekî n qar-lomê..

Dayka AZAD ê mın lê lê
bî dost meyn fexr-bawerya bomê,
Goştê meriv ew dîxaşînin
xwe lî meriv dîkîne lome..

Dayka AZAD ê mın lê lê
lı hevya ecelê xwe çavreşê
Zar hıldıde, zar davêje
lê naynê şeş û şeşê..

Dayka AZAD ê mın lê lê
av tê ne man çavê xwe da xwe bigri,
Xwe l' pey xortê xwe hê bı rûh ,
hê xwe l' bın siya wi da nesitri..

* * * *



Mın dıgo,
tu teyrê mala mın **Çmo**. tu **Çmaro**,
tu mın teyrê kej, teyrê baz i,
bı mın law i, xarzê xalan, ap biraz i.
Ew te çı zû, xwe revand jı ber destan,
te xwe lı ser çı çiyayê kesran,
lı ser çı çemê hêsrana dani,
Ew çı erda xwe ker û lal e,
te dihewine,
jı dayka xwe ra tu dırazi?!..

CARE CARİN

Lao! dıkım qêrın, dıkım gazi!
jı halê te ra nabım razi!
Ev tu ne evê axa reş bûy,
dibên hakım, ku dibên qazi!..

* * * *

Ezê lao giran ser im,
sing tiji me, dil keder im.
Kingê têm, digijim ba te,
xwe j' qederê ne bawer im!..

* * * *

Mı go lao, ez simbil im,
sıtû xwar im, dil bı kul im.
Xwe Jı xortê xwe dûr ketime,
lı xwe nadım rex û pel im.

* * * *

Dıbêm lao, ez bılbil im,
çepık sor im, dev nıkıl im.
Mıl û baskên xwe qetiyam ,
lı ser lingê kulekul im.

* * * *

Lao, dilê dayka te xûrek e,
weki def û tembûrek e.
Destê xwe lêxi xelasnabi,
qe lê gazın, sitem meke!..

* * * *

Lao, evê aşûrê, ev revani,
ji hêk û genim mi lı hev ani.
Loka paşın bı destêm bixwe,
ez malî me, tu mêvan i..

* * * *

Ne rê lao, ne rêder ım,
çav xwe he me, jê bêfer ım.
Rıya xwe nişani daykê bide,
ber bı mırınê ez ji herım..

* * * *

Qelem gerandım lı ser kaxızê,
gotım lı ser, te kırme rêzê.
cıqas gotım dil têr nebûm,
kula te ra bû çerêzê!..

* * * *

Hıldam qelem û kaxazê,
mınê lêxıst bı dewsa sazê.
Dest pêkırım ku bıbêjim,
gıriyê xwe xıstım ber awazê.

* * * *

Lo AZADo gûrinoko,
sıng dıxrandi bı neynoko!
Emê kingê bıgıjın hev,
kêlek deynin ber kêleko?!..

* * * *

Lao, ew mışkên binê tewşo,
ew marên nava cıl û berşo.
Ev dewran lı gori dilê wan e,
dınya bı wan, boş û tewşo!..

* * * *

Dîbên lao tebarek e,
goştê berxa bimbarek e..
Ez bızına hesti qelsım,
mırın bı mın emel nake!..

* * * *

ÇINARo lao, ez qûrbano,
tirê hılda jı kevano!
Bıxe lı dayka bırındarê,
xwe bıke karê nêçirvano

* * * *

Lao mırın hespê sorê,
seyis jê ra çala gorê.
şêr û qeşeng sûwarê ewıl,
bêkêr, teral, hê l' ber dorê!..

* * * *

Jı rojan lao, iro şeş e,
bıhar rojên xwe ra xweş e.
Xıst lı mınê jı xewn û xıyal,
barxana mın wek dimeşe...

* * * *

Em lao, bextê me bıreş e,
rûçık, rengê xwe Hebeş e.
Ser hevrişm bıkeve dışkê,
dıkeve şûna yek zebeş e..

* * * *

Rabe lao, xwe hilweşe,
bine şayi, jî me ra neşe.
Mî xwazili meyne bî wan,
nav û bextên xwe qelpreşe..

* * * *

Xortêm saza xwe jî dar meşe,
bêdeng mayî lî qûncîk, koşe..
Jî halê wê ra kî kêf bine,
pêçî jî destên xwe bîweşe..

* * * *

Çîbkîm vî emrê xwe xedaro,
bû kervan û, bû qetaro,
Kula xortêm bîfroşe mîn,
w'ez xêridar, ew etaro!..

* * * *

Xuşîne hewarê, teqe-teq e...
çem û dar xwe dîkîm leqe-leq e.
Hîsa xortêm nay mîn gîdîno,
tên xwe dengên.. req û beq e!..

* * * *

Lao, ez çî bîkîm hînge hînge,
pêş dirêj bîm, kîr bîm lînge?
Ku nebinîm ber bî te têm,
hazîr bûme lî xwe dînge?..

* * * *

Çı hal e tu nızani lao?
dê dimre, digri bavo!..
Were jê xatıra bixwaze,
xwe bıgre lı xwe çavo!..

* * * *

Ez bımrım lao, lao!
dıl bûm palas-kulavo!
Neditım jı te ra gotın,
bû zava.. dıbe bavo!..

* * * *

Ax lao! rabe lao, lao
w'ez çêkım aşûre, helavo.
Jê hesdıki, têr bıxwe,
kula xwe derxe jı dılando!.

* * * *

Lao, nexweş dê, nale-nal e,
derman tırş e pê, tûj e, tal e..
Lı ser dılê wê bicerwin,
awırên xwe yê melal e..

* * * *

Lao, weki fitila çıra me,
jiyan jı mı ra heram e..
Ha mam lı pey te, ha nemam,
ha ketım devê gura me..

* * * *

Lo lao dayka te mo,
bûm dara kulê û xemo..
Yek carek dı min da derê,
weşinim goştê xwe mo!..

* * * *

Cıwanê, ax tu bîst û çar salo,
yên dor te ku pir bın û kalo..
Xort emsalên te lı vır bın,
nebini jı xwe ra hevalo?!..

* * * *

Berxo, lı min berano,
bibe mêvanê xewnano..
xwe mı n yek car nişande,
bıde xatirê hêsrano!..

* * * *

Lo lao reben ezê,
çok-milêm dilerizê.
Dıl-gurçık dıhelinim,
birtinim **PERLAŞEZÊ**..

* * * *

XWAZILİ

Loqa felekê girin e bang e,
nay cûtnê xav û xang e.
Xwazilya daykan bî wan tine,
bîra, xwe l'pîştî bîra, lî pîştî xwangê!..

Dîlê daykê lî xwe teng e,
çaraliyê xwe xwûn e reng-e.
Xwazilya xwe tine bî wê malê,
xortên xwe lî dora dê û xwangê..

Mezel jî kevîr, xweli xang e,
menzel, çavi lî xwe tang e
Xweziya min tine bî gora wê dê,
ser lê dîdîn, dudo xwang in,
dudo bîrangê.

BÛYA

Car carên cara bûya,
Dıkşand çixara bûya,
Jı dev dûman derdixıst,
AZADêm bı bara bûya!..

Roj, roja xêra bûya,
xêr-xêyrat pê ra bûya!
Mezelê daykê dıkolın,
Dengê tewr-bêra bûya!..

Xwe daykê qûrban bûya,
lı rastê hazır bûya!
Gora wê bı dêstê xwe saz dıkır
AZADêm nazır bûya!..

Anê, jı çokan bûya,
nexweşa gıran bûya!
Xebera xortê xwe nebhista,
xwe mêji xopan bûya!..

KESİ NEGOT

Bilgo, xwe emrê xwe lê bı reşê,
te çikır aqıl, lı xwe heşê?
Tu firfiroka yek wexteki,
xwe keti halê kêz û mêşê..

Xwe tu suwara gaz û kêşê,
iro çav dıbarina, dıl biêşê.
Xortê xwe av-behrê da avêtiy,
te wi xwey kır lı nav paşıl,
lı ser pêşê!..

Te ÇINARÊ xwe ani û dani hewşê
robı ro nihêrti lı reng û rewşê..
Kesi ne got, ev te xoş emeg wê bıçe avê,
xwe wusa xûya, lê wusa kıfşê!..

DU KÊLIK

Mî dit, xwûşkê xortêm rûniştine,
yek dibêje, xwe ji yeki ra:
"Bîrayê me bîra! ket nava diyar û beyara,
xwe ra bijart xweliya nenas
ji erd û baxçê war ne yara!..
Bî ava Behra wan canê xwe şûşt,
bû hepsiyê du kêlik û çar dîwara!.."

Heywax felekê heywax!
dîbirri zman û zara!
Dubhêri tîfikan,
dîstini teled û wara!..»

Xwûşka dîn ji, lê wedîgerine:
«Gerdenzero» dibê, «xwe me bîra!
ri xweş dîçû ser hînara!
Serçavê xweşik lî ser bejna şîtl,
şîkîl dara hewr, çînara!
De xwezîl, ew roja ku tu dîçûy ji desta,
daykê derketa serê gazan, har zînara!
Seyran bîkra çemê diherîkîn bî berfa mîştî,
dîhatîn ji girê çîya,
tîjî dîkîrîn dol-qûntara!..
Hêstrên xwe lî nav wan xîsta wê ji,
şûna baranên meh Nisanê,
dewsa aşîtên dem bîhara!.."

Heywax felekê heywax!
tu xweyê bela bî embara,
Dîşkênî xwe çîqas dîlan,
dîstîni nîfir.. întîzara!.."

AZADo bira, lo gelo bira!
lo em du xwûşk bûn, dudo bira!
Weki du cot pırıkên biper,
bıfırın lı dora şewqa çıra!
Ew roja ku destê xwe te qetand
jı destê xwe Bıjarê bira,
Daykê, xwe ra digri û digri,
xwe dıbarine şor hêsıra!

Û xwezilya xwe tine bı ew rojên,
te maç dıkiri xwe bıçûkê bira,
Destê te lı sermıl, jê ra dıgoti,
" şırino, şekıro kekê mın, keko bira!"

Heywax felekê heywax!
gewlê te bı nexwaz û neyara,
Ku bı rê nexi revıyan,
helgirtne xwe ra pışti û bara!.."

Bırayê me bira, diket nav tewgera,
mezın cıvata, kom cıwana,
dıkşand serê maqûl-kıbara!..
Ew tıştê lı merıv giran e xwangê,
felek heyfa merıv tine lı **heyfan**
Xwe serê ewıl berê wan dıde gorê,
lı ser dılan dadıxe fıgan-fızara!.."

Heywax felekê heywax!
lı te bıbarın agır bı bara!
Hew kêfa xwe bini
bı dûpışk û kêwjar û mara!.."

N A Y N O (*)

Ew ji kêmasiya daykê lawo,
çı dibê lı bextê te reş nayno.
Çûndına te, çûndıneke ha wılo
dev-qeleman lê xweş nayno!

Jiyin- jıyanê lı hev nayno,
giri dıl da şabûn nayno.
Lawêm kula xwe dayka xwe ra,
mırın vır da ray lê nayno!

Felek can-gıyan dıbe, nayno,
wan dıqetın lı hev danayno!
Dewran tine, û ha dewran dıbe,
xwe j' dev gırtiyên me xeber nayno!..

Bira kula ye dılên dê-daykano,
tjiya giri, ha bı hêstrano.
Qeweta xwe ninın
 ji feleka xwe pırskın
Çıma dıbe xort-levendan,
me çıma dihêle lı pey wano??

X E W N

Xwe mı dit işev dıfırım weki,
lı ser mın keftanê dewrêş,
bı neqşê zêr, gulavdûnê.
Cotê perê xwe dıçırısım
şewqê dane gul, beybûnê..

Dıfırım lı ser Elegezê, Qûlpê,
Diyarbakır, Botan, Cızırê,
dıghêm Ruhayê, Mêrdinê..
Çavê mın lê, dıçım ber pê,
xwe dıbinım mın ew
«Xevna Lê Xêr bin ê..»

Xortek leqay mı tê, tê ber bı mın,
ew nızanım ku yê minê,
mın dıbe û bı xwe ra dıgerinê.
Datine nav cıvatek jin-pirekan,
xwe hinek por serê xwe reş in,
hinek kezi-guli tev sıpi nê..

Hinek rûniştine nan dipêjin,
xwarên ser sêlan, ser tennûrê,
Hinek bı hevra mışavere dıkın,
tıştan dıpıvın bı mêzinê..

Ew ez nızanım dıkşının êşa dê-bav,
ya ku derdê Leyl û Mecnûnê?
ku dıkın-nakın mêzin xwar nay,
ber bı mıl, ali yê dınê..

Lê jineki ku wan jê ra dıgotın «dinê»,
gazi wan dike xwe lı hev tinê.
"Em ketine çı dozê ê ra?" dibê,
"bı wê kışandın, bı wê pıvinê?
Me mıl û baskên xwe şıkand,
singa xwe qelaşt bı qêrinê.

Em xwedıgerın lı derdê gıran,
binın, bicervının êşa xortan!
Awırên wanên dikewandın dılan,
kırne tırka canê xwe şêrinê.

Û, lı pey wan av bıqşının
jı bira dilê me rebenên daykan,
Ka binêrın tal e, tûj e xwe tam,
rengê xwe çı figan e, çı qêrin ê?"

Çıma herkes dıkesire tenê bı wan,
dıbe behsa Xecê, Memo - Zinê,
dayikên wan xwe ra çı hal-ehval da ne,
kes çıma xebera xwe jı wan ninê?!..."

DESMALA BAYÊ (*)

Bigre desmal Bilgo dayê,
bibe-bine bî sır û bayê!
Wê l'ser AZADê m bawêşinke,
bî ew hesretên dil da mayê..

Ew hesretên ku dil mayê
tu bîke hespê evê bayê!
AZADê m lî ser pîştâ wê suwarke,
bîşine Şirnaş Dûderyayê..

Bîşine Şirnaş, Dûderyayê,
gundê bavê, gundê dayê!
Bra kalanê xwe jê bîpîrsîn,
heyani nuha xwe l' kû mayê?

Heyani niha xwe l' kû mayê,
wê AZAD bîbê jî wan ra yê,
Ew sirgûnê cî-warê xwe
bî destê bêbava Tirk cûntayê..

Jî destê bêbava Tirk cûntayê,
AZAD xwe avêti Fransayê.
Ew jê bêri, em ne haybûn
xwe l' vîr birêj çavkên dayê!..

Xwe lî vîr birêj çavkên dayê,
omîda wê bîbirre jî dinyayê,
Berê wê bîde **PERLAŞEZE**,
Mekke-Kabe xwebîbir nayê!

Mekkê-Kabe ku bîbir nayê,
û nîfir bike lî cûntayê.

Ewê ku wan jî welat qetandî,
bên dalqandî bî pêsirayê!..

Bên dalqandî bî pêsirayê,
Tirk jî xwe bîbinî ecêbayê!

Heriyê ku wan lî **KURDa** kirîne,
bê pêşya pîse-pîsê Orûmayê!..

* * * *

O D E

Daykê lî ser du kerî ye,
Oda xortêm bê serî ye!
Xwe çûy, neçûy gav navêtmê,
Lê venekîr mîn derî ye..

Oda xortêm bê serî ye,
dê venake lê derî ye.
Serê xwe da wundakîm, tê ku jîm ra
lê ku nabe, Dînya mirat.. lî me lao,
xwe bî hember-hemberî ye..

XERÏB

Ne tu navê xwe lı serê,
ne emr, şıklê te lı berê!
Ki zane tu jı xelkê kûderê?

TU xerib... mezel xerib!..

Ne te cılên xwe, ne libas,
ne mıdasên xwe, ne kıdas.
Xwe l' ciyê bêsay û iltimas,

TU xerib... mezel xerib!..

Ne çûndına te, ne hatın,
ne rabûna te, rûniştın,
Ki hatın ba te te hiştın,

TU xerib... mezel xerib!..

Ne dostê te, hevalên te,
ne hembaz, embazên te,
Ne l' vır xêr nexwazên te,

TU xerib... mezel xerib!..

Ne l' vır wey -xwedanê te,
ne met û xalanên te,
Te pırskın apanên te,

TU xerib... mezel xerib!..

Ne gelan, gıdanên te,
ne mali, mêvanên te,
Ew jı te dûr ciranên te,

TU xerib... mezel xerib!..

Ne ew xweliya axa te,
ne xwe hewş, eyvana te,
Ne gundê niştimana te,
TU xeerib... mezel xerib!..

Ne kam, şadimana te,
ne kul-derd, arana te,
Xwe bê hay ji birin dayka te,
TU xeerib... mezel xerib!..

Ne zalım qedera te,
ne ew dêl feleka te,
Ne ji dinyê xebera te,
TU xeerib... mezel xerib!..

Ne bıhar, payiza te,
ne xewn û xayiza te,
Ev der ne bı gewl, rıza te,
TU xeerib... mezel xerib!..

Tên diya te, bavê te,
xwuşkên te, birayê te,
Te l' vir xıyal nakın te,
TU xeerib... mezel xerib!..

Ne j' dê û bavê te haya te,
hatın, nehatın hafa te,
Kırın ziyaret, tevafa te,
TU xeerib... mezel xerib!..

Ka l' vîr şûştina canê te,
şehkîrîna poçaxên te,
Xwe simêl qeytanên te?
TU xerib... mezel xerib!..

Havin, xwe zivîstana te,
berf û baran xwe l' ser te,
Nahesînîna bî sermayê, germê te,
TU xerib... mezel xerib!..

Ne merhem, dermanên te,
ne xwe hêrs -fermanên te,
Ne berhem, zîrarên te,
TU xerib... mezel xerib!..

Ne l' vîr kitêbên xwe bixwîni,
ne sing-berê xwe bixrîni,
Bî çî hewî-hewya xwe bîni,
TU xerib... mezel xerib!..

TU mîn xortê minê cergebez,
tu xwe Kurdê qur e, kurdê fez,
Te got "Ki me?.." neghiştî "..Ez"
TU xerib... mezel xerib!..

Tu suwar nebûy lî hespê xwe,
hefsar nedayî destê xwe,
Xwe bîwar nekîr neslê xwe,
TU xerib... mezel xerib!..

Zeman te l' mın kır du kêrt-e
bû wexta bı te, pışti te..
Jı roja tu çûy, mın hışti te,
Mın dayka reben.. xerib!..

Bıdım ez lı serê canê xwe,
mın hebûn, tunnebûna xwe,
Mırına te ya bêiman,
mın bike mêvanê te
lı rû te mezel .. xerib..

DENGÊ BÊDİL

Lı himbera mala me dêrek hey,
seri tûjê, teng e navmıl, çepilê.
Nızam bı destê kujan hoste çêbûy.
bini fire, jorda zirav xwe şikilê!
Şin -şahiyê lı gel ilam dıke,
dengê çana xwe ku vedıke,
ji xwe ra lêdıxe ku l' zengilê..

Dıbêm derê! şikıl hûni yê, lûlê,
ne l' gori hêlina kewê û bıbilê!
Her carê xwe vırda-wê da direvinım,
ku tê dengê nagosa te,
hezinê, mehzûnê û bêdilê!..
Belê ku zanım, faniki dın verêdıki,
lê werkiri ava gulê, av simbilê!..

Oî û dinê me xwe ne yek dêrê dibêm,
ezê Îslam, tu Filla Xaç sîpîçilê!..
Sondam lî ser Hz. Mihemed, Qûr'an,
ya te bî navê Hz.Îsa, ser bî Încilê..
Ew e, adetên me naçin ser hev,
em mîrîyên xwe verênakîn
bî lêxîstîna zangoç, dengê zilê!..
Lê hercarê
lêxîstîna te bêdîl tê mîn,
weki hewara xortêm rabke cardîn,
Xwe mîn jî hîşê mîn dîke, mîn dîke
jî qeweta çok û gavan .. mîn ez dilê!..

TUNNE

Felek bawerîya wê tunne lao,
dîke karê hîşk bêbava.
Ku lî hesabê wê nay lî hev dixe,
vedîgerine dem û gava..

Lî zora mîn tê ku wexteki,
evê lî piya, teşî rêsa xelkê,
ew tu merdê xortê mîn bûy,
Îro ez im de wê car, dixwazim
lî kûrê xelqê dîkîm lava..
Xwe jî xwe ra jî dibînim,
ewê xerib, xwe xerib in,
Xwe hemû nagrîn ciyê
xort helalê dê û bava!..

* * * *

Dilo de were meare,
mebe baran mebare!
felekê debra xwe hılani,
jı te ra nehıst zıbare!.

* * * *

BIBARİ

Lao, tu devê te lı xwe sar i,
ez bı zar ım, tu bê zar i..
Kevır lı canê xwe bıbarım,
ez lı rûyê erdê, tu lı xwar i!.

Ne lı dora te çiyayê bani,
ne jı welatên te çem û kani!
Reben ım lao, tu l' kû, ez dızanım,
ez çı dıkım, tu nızani!..

Ev tu qûlka reş da, tari,
dı mı da dıbarini ağır û xari!
Hatınam nexweş ba te bêm lao,
xwe l' ser te dızarım bı bêari!..

Dılê xwe bûm perçe, pari,
demayi pêş mın tu yek cari!
Xewne rojan da te nabinım,
ağır lı mın dayka te bıbari!..

* * * *

Minê bigota

Ha lı minê şıplê,

ji gul û rihan şıtılê,

Ser û çavê xwe, dev lı ken

hubê tine ji dilê..

eger xortê m ji qızek qızan bûya..

* * * *

ÇEND KÛLM

Devê xwe lı xwe wenegerım, lao tışteq nebêjim ,
destê m dikevin şûnê, ew dınvisin-dibêjin.

Hêvi dıkim ez ji te, xwe ji xortê xwe kej-ım,

navê m dermexine ezê sewsi me, gêj ım..

Xelasbûna mın tunne, ji dayka xwe ra nebêji,

yekcar ji mın nestini, mabım bı xwe ra mêji..

Ku bikevi xewna mın, bı bejna xwe dirêji

işev xortê xwe ditime, w'ez karıbım bıbêjim..

Evê hesretê lao ji dilê daykê davêji,

xewna minê da eger tu navê wan bıbêji,

Emsalên te ki ne, tu bı ke ra dileyzi(!),

kapê xwe lao lı wêder, gelo bı kê ra davêji?!

Ezê bı çı sazi lao, ka ji kê ra bıbêjim,

çend kulm kula xwe w'ezê, dı ser kê da bı rêjim,

Ku keti xewna mın işev, bı mı ra xeber neday,

heşyar bûm ku.. sexık ım, ezê sewsi me.. gêj ım..

HAVÎNE LAO(*)

Havin e lao, havin e,
bı ewr û dilopên tavin e..
Tin û germa wê da eza te bı lerz,,
ew yek nexweşa tawi me... lao!..

Havin e lao, havin e,
xwe l' ser dem û rojên gavin e.
Ev bı gul û xûnçe, bı kam û şahî,
dayka te dilorine, dilawine.. lao!..

Havin e lao, havin e ,
ev xwe serê meha navin e!..
Çıl û heşt rojê me ma, emê hev ra,
ev dem-ditînên me, dawî ne.. lao!..

Havin e lao, havin e,
dîlêm xwe ew dara kul axpin e.
Çavên kê dinêrim geş m, ew beş,
yê min bı şîrin, şîravi ne Lao!..

Havin e lao, havin e ,
xwezi bı çavên ku wê navin-e!
Xortêm qetand wê jî pêş çavê min,
jî tîrsê xof m, sawî me.. lao!..

Havinê lao, havinê ,
wê bijart berxê min xavênê . .
Jî dinyê ra kêf û sefa belavkır,
jî xortêm sitend lawinê.. lao..

Havin e lao, havin e,
dızûrin e xwe gurên harin-e!

Mın mezêl mezêl lı xortê xwe dıgerın,
jı hêsrân eza korê, te navine.. lao.

Havin e lao, havin e lao,
elûep lı qırkê, pırani ne!

hêmin, hêjayên xwe ra bı hejmar,
xwe jı wan ra xelayi, xızanin e.. lao!..

Havin e lao, havin e ,
wexta petêx-zeveş-qawın e !..

Kula te l' ber wan xûriniya mın,
şiv-taştiya mın, fırawin e.. lao!..

Havin e lao, havin e ,
şixûl kef e, şayin e.

Tê dengê zırna zind û zêndiyan,
diya te digri, dızarine.. lao!..

Havin e lao, havin e ,
w'ez rebena dora te xali me !.

Bêm, xwe bavêm ser te, xulq ninım,
xwe jı dıl felc ım, bawı me.. lao!..

Havin e lao, havin e,
çelqandım mêji, hawı me!

Siheta xw nakım qe behs û bazar,
jı wi ali ew nızam çıma qawı me!..

NE EBED E

Mewatê felekê nav xeravê,
neseb pûçê, ji nenas bavê!
Xençer ji par va l' meriv dixi,
wexta ku tini keys û gavê!..

Felek dêlê xebermede!
kumê serê min hilmede!
B1 ev şûrê ku te l1 m1 x1st,
mebê «kezeb l1 me tev kezeb e,
kezeba dinan bê edeb e!..»



Felek, ev dinya te wê bipelşe!
iro nebe, sibê nebe!
Her çar rûknê xwe wê hılweşe,
weki sûra l1 Serhed e!

Tu ji bîndest felek, tu ji fani,
çerx dîşkêni ew ro hebe!
Aşê xwe îdi nagermî,
dîbîni dewran ne ebed e!..

DIBIN - T İ N İ N

Kulên xortê xwe bîrîm-anîm,
lî ser dilê xwe şînbax danîm.
Bî baê kesrê, baê giri,
bîna xortêm dîbîn û tinîn.

Ew hesreta me ra navendî nîn,
bî pel û şîtl.. bî reng û bîhn in;
Bî mij in her wext, bî avî ne,
wek xortêm xwe naçîlmîsîn!..

Baxban in ew, meyxûr nînîn,
rondîk wedîxwûn, mîn dîgrînîn.
Jî bêriya mî ra ew derman in,
xortê mîn jî mîn naçetînîn!

Lê çîft in ew, bî peşk in, bêoxîr in,
wekî xortêm naysî - nabhurîn!
Kula ku danî lî ser ev bax ,
ev bax lî mîn xerab kîrîn..

ŞEMİTİ

AZAD e mın sere xwe hılandı ,
çû.. jı dınya wêran xeyidi..
Zexq û sefa wê hışt xwe jê ra
xwe j'ser behrek şeqiti..

Behr, ava xwe lı canê wi hat(!),
hewya xwe tê da tewiti;
Hesabê birri jı me, jı wê,
haya xwe nebû jı xwe dınyê,
agır pêket.. şewiti..

"Çıhat seri?" daykê xortê xwe pırsi
xwe jı feleka hıt-hıti..
Wê got: "heşe keçê, dengê xwe meke,
berx û beran lı xwe nayên,
bı texmina mın perpti.."

Ew lı hınek dılan ra xweş nehat
lı biyanê jı bo çı bû xewiti,
Reş nezeran dıl şıkandın, xeyidandın,
jı dınya mirat, xwe
awê siterk.. şemiti!..

XURBETÇI

Perlaşezê, wey lî minê lê mewatê,
can dıxwazi ez bıdım te,
jı laşê xwe ra ez çerçi me.
Lı bın pê xortê mın ciyê xwe daynım,
xwe jê ra bıkıım ver bekçi-me..

Kesên bıçın-bên xwe ser me dan
w'ez bıbinım tewdira xwe nobetçine,
W'ez gazi bıkıım yek jı wan ra,
bıbêm dergevano, ez heyrano!
lı gundê hanê, ez jı hal-ehval xeberçi me..

Herçi mezelên ku l' ser xwe xweş avano,
xwey-xwedanên ew belû ne!
Lê herçiyên kevırên xwe xam û, xav ın
gul- kulilkên xwe çılmısine,
Tu t êkilya xwe bı wan meyne,
dıl-qelbê wan meêşine!
Ewên ku dırazının paşla xwe da,
xortê Kurd ın , xêr nedi no, sıyasi ne,
Lı qebristan xerıbastianê hal-hazırı
nav û dengê xwe «Xûrbetçi ne»!..

DILO WERE

Dilo havin e.. Va disa hat..

Weki Duderya, mî gundê bavê,

ez jî hîşkeloki zûva bûm.

Jî avê, pişê, jî mijê mehrûm,

çend perçe, çend ali va çûm..

Çi gotim tal û tûj hat,

bî şerbet, şirani ninbûn,

Nehatî jî hêla Qûlp ê, Qozlîx ê,

ne bî tama hingivê Wanê bûn..

Ev tu lî geşî dîgeriyay dîlo,

ew te dixwest xweşî.. şabûn..

Nîzanbûy ev berhemên şewatê,

ne bî kêf-xwestîna dayê bûn..

De tu were dîlo!

ez iro, te dîr xîm

jî derd û kulan ,

te weki meyxuran serweşkîm!.

Hewzekî çêkîm ,

şîklî û cîwaniya xort bextreşan

lî der-dora te pêşkeşkîm.

Hemû şehidên me Kurdan
bıkım avpijina wê,
bıpijkınım ber bı esman,
hewzê jêr da, bı xwûn,
xwuydana wan tıjekım.
Û pêlên wê bıdım peyhev,
ew ber bı behran firekım.

Dema ku wê deng û
dest bı şırına xwe kır,
ser bıhelım goştê xwe dıl,
Behra Sipi, behra Mediteranê,
w'ezê pê şermi û rûreş kım..

Û hê paşê..
berê me bıdım deşt û çıyan,
bê me dengê çıvık, pez û berxan
dılê xwe em bı wan ra geşkın!
Guhên xwe bıdın dengbêj, şıvan
bıxın jı me ra lı bılûran,
hesret lı me peşrevkın.

Ku me dit,
Pelê darên çınaran..
pelên hewr û gûzan
hênık hênık bımeşın,
xwe bılorının jı me ran,
Dılxeşi, şabûn ev e
emê bêjın,
lı felekê bêbexti nekın!

Û em bîbinın,
şerqa serê sıban
avêt lı me ji **Kurda n..**
Me ji dit tirêjên royê
avêti lı piştta çıyan!
Rabûne biskûlên
beybûnan-rıhan
vebûne, fetiqine
guli, bişkû ji kêfan..

Em ji,
xwe bîbinın lı welat,
lı zozan, berx û beran,
daye hevdu berivan,
Ro lı berawa, difetılın,
qewlê sıbê dane hev,
Dıxwazın
ji hiv û rojê xatıran!
ıdı natırsın ji sıbên xwe
ji pêşerojan xwe, ji dotıran!..

Ez ji, **ev defter** bıgrım lı vır
û bıqefêlım yek bı yek
lı ser hevdu rûperan!..

Lê belki?!
AZAD êm dıxwaze
çend gotın ji dınya wêran.
Çı çû, çi ma lı pey xwe,
derxım ji dil hesretan(!)..

XANA DINGO

Dunya?..

xan e lao.. xana Dingo..

Hinek tê da lı defê dıxın,

hinek dıxın lı tasa çingo..

Hinek..

goş tê xwe da dışewıtın,

Hinek,

nêçirvanên kew-pılingo!..

Hinek..

hukmên gelan devê wan da,

fermanên xwe bı nav û dengo!

zulüm, zorbeti dı rêçûna wan da,

dınya, kainat lı wan tengö!..

Bı xêra serê sêwiyan,

ew dıxwun loq û pariyan,

Belengazan verêdıkın

riya kuştın, mırınê

şerê ber devê tıvingo!

Çı xema wan e

jiyana xortên me evdalan,

ro nedityên yek caran,

Lı ser ray û emrên wan,,

hêna bê wext, bê zeman

dıkevın bı axa zıcarı,

Dırızın bı hilma gemari,

dı nava kam û kamçok û

zengö!..

SÊ BIHAR E

Lı pey te
va dıbhure sê bıhar e..
sê bıhar.. çavê m lê barnave
weki kul e, weki jar e..
Xwe jı xwe va mın dıgot,
ez nagijım bıharek dın lao,
çı hışkı be, çı bıbare!..

Sê bıhar e..
ez lı mal ım pırayı,
lê dınyê kemılı ye,
bı hêşını, bı hêşınayı!..

Darên ku
te hıştın sê bıhar e,
guliyê jêr gıştın erdê,
yê jorin bûn sê qatê te..
bı bejnahi!..

Bın fire ne
hınek jı wan,
lı ser serê xwe
lûlık, lûl m.

Hınek jı wan
seri tûj û zırav,
şıkı qemçıka
wek duldul m..

* * * * *

Hevalê xwe

bırsi sê bihar e..

jı te ra bêjım ku,

hınek bûn

xwedyê zêç û mal.

Zarûyê xwe bûn

hınek sê bihar e...

xasıma navê te

lı wan danin.

Xweanha birêva dıçın,

bûn bıdev-zman...

Hınek jı wan weki te..

xwe borık in, zer,

hınek ji qerık in,

xweşik in, esmer..

* * * *

Û, dı emrê te da çûn,

çend xort hevalên te ji.

Îro, dayikê wan weki mın,

d'agirê xwe da dıkelıjn..

Û, rê-rewş jı mın dıpırsın,

mın çı xweli lı xwe kır,

ew çı toprax lı xwe kın?

* * * *

Lao, lê bîbêy
lî dinyê çî bîhuri sê bîhar e?
Ku xûnxwarê Seddam,
leşker avêt ser Kuweytê,
Kapitalistê dinyê
tev ketin derdê petrolê,
gotin "**Ev ya Hitler e,**
gerek serê wi bê jêkîrîn."

Û gîhiştin serê bîhev ra,
ku muddetîk nefesa wi bîbîrîn..
Qe neanin bira xwe,
ewî lî Helepçeyê,
yê xwe lî Kurda kîrîbû!..

Seddam wê paşê,
ku serê xwe bîlîndkîrî pari,
carkedîn dişa gîhişt ser Kurdan,
Kurdên me carkadîn wekî berê
derketîn xwe ra koç -seferê..

Jî tîrsa bomban, mîtralyoz,
tîrka ci-warên xwe kîrîn,
Ew dema ku
berf-baran, bager-bahoz,
xwe avêtin ser Tîrka
ew jî nexwazên berê!

Hê, qîrardan Bûş û Major, Mitterand,
wekî petrol Kurdan jî bîparêzîn.
Pîştî ku serma zor ûreş da,
roê hezar kes jî wan mîrîn..

İro federasyon dibêjin,
rûniştin xwe ra saz kırım..
Anha parlamento xwe hene,
xwe ber bî azadiyê rakırın..

* * * *

Jî Kurdistana Îranê,
Doxtor Şerefkendi û xwe sê heval,
lî Berlinê hatın qetilkırın,
Ew ji weki **Qasımlo Ewdurrehman,**
jî ali hikûmata Îran!..
İro ew ji cıranê te lî **PERLAŞEZÊ,**
gerek hûn agahtarên hev bın,
zanıbın **HÛN** ne jî hev dûr in!..

* * * *

Lê çî hatın serê devletên dınên,
bêjim te ra eva sê bîhar e!
Tu nızani çewa weki diwarê qarton
lî ser hev helışin û qelıbin,
Yên ku dıgotın "Cûmhûriyetê Sovyet",
jî hev qetıyan yek bî yek.
Ewıl Gorbaçov wan jî serê xwe avêt,
dor lî wan ani **paşê Yeltsin...**

Weki berê neman ıdı

Çekoslovakya, Yugoslavya.

Gıhiştın hev Dogu Berlin, Batı Berlin,

Honeker ji qatıl û xayin elan kırım!..

İro ji, Sırp, Xırvat û Boşnak ketine hev,

ka ku heyani kûder zora hevdu bırım?..

Tışteki ji heyi, te ra bêjım,

ew bo me Kurda heri gırıng.

wê kêfa te ji bê zanıbi ku,

hınek hezên Kurdistan Bakurê,

Gohê xwe dan daxwazya gel,

dı nava hev da aşiti, dostiti,

pıçek bıratı saz kırım!..

Xwedê bıke nebe ixaneti,

dewa xwe heta dawiyê bıbın!..

* * * *

Lao,

dıbên disa leşkerên Tırka

dagırtne ser qawırên me, dewara,

Xerabkırine Qûlpê,

Lıcê, Şırnasê, Dûderya,

yaxme anine lı kevara..

Ketine mezelên bav-kalan,

xırabkırine çeper -diwara.

Gıştine ser xorta, egıt û mêrxas

dıbırın zıryet, nahêlin wara.

Canê heyf rast dıkın lı rastiyê,
kaş dıkın lı erd-goxara..
Yê mayin nızanın êdi bikenın,
ya jı xwe ra bıgrın..
bı zare-zara!.

Pır caran xwe dibêlao
te dayka te, xwe jı xwe ra,
de ku mırın dıhat
te jı xortê mı ra,
wusa dibû xwe bıhata bra!.

Ew te mırnek wusa dıxwest,
şerê xwe bes dibûy bı kevıran bra!
Ser axa xwe def dıkırı,
ew leşkerên Tırk kafıra..

Mırın heye ku.. zor zalim e..
Mırın heye Walle dı qırkê da dıçe,
rehet dıke carna dılan,
dıkeve şûna av kefsera!.

* * * * *

GOVEND DAYNIM (*)

Ev çı xem e, çı keder e, dilo lı te çı lerz e?
Çı dilreşi lı te hat; çı derd-kesera berz-e?
De tu kula xwe bine, em lêxım rûmûz-remz-e,
Ezê govend daynım.. xwe bîhêjine..
bı kêrsima wê ra.. tu bileyze(!)..

De dilo were bileyze(!).
de were dilo tu bileyze(!)..

Gırti mayi dı nav çar dıwarên yek hewş-e,
jê derketın tunine; ne rê, rêder, ne rewş e.
Bigriy, bımri, bıkeni tev hiç e, boş e, tewş e,
Ezê govend daynım.. xwe bîhêjine..
tu bı hêstrên xwe ra.. tu bileyze!..

De dilo were bileyze(!).
de were dilo tu bileyze(!)..

Digriy, digriy qınyat nayni, hê nabêji ku bes e,
Çıbki-neki deng nastini, ev jan ker e, bêhes e.
Textê(!) xortê te saxlem dilo, xwe ra meke weswese,
Ezê govend daynım .. xwe bîhêjine..
tu bı kesra xwe ra.. tu bileyze!..

De dilo were bileyze(!)..
de were dilo tu bileyze(!)..

Xortê te xêr nedit.. mîrad nekîr ne beis e!
Bes, bî têra xwe hîşt, ev şewata serdews -e.
Qam û gûca xwe hilde, jî te ra nebêjn «sews e!»
Ezê govend daynîm .. xwe bîhêjine..
bî hezrîngên xwe ra.. tu bileyze!..

De dîlo were bileyze(!).
de were dîlo tu bileyze(!)..

Berxê te radzê lî rastîyê, ne l'kaş û hevraz e,
Xamûş.. nêzi dar çinarek, baê xwe jê ra awaz e.
Va lî serê dîçe-tê, deng ziz e, jî nay û saz-e,
Ezê govend daynîm.. xwe bîhêjine!..
bî ahênga wê ra.. tu bileyze!..

De dîlo were bileyze(!)..
de dîlo were tu bileyze(!)..

Xortê te henekvan e, hezdîke jî yariyê, tînaz -e,
«Megri, melorin anê!» dibê, «rastke kêfa bî naz-e!»
Tu bîcvîne heval-hogîr, dost û yarê hemraz-e,
Ezê govend daynîm.. xwe bîhêjine..
tu jî kerba xwe ra.. tu bileyze!..

De dîlo were bileyze(!).
de were dîlo tu bileyze!..


AZADê te mayi dî nav çit-çeperên çar gaze,
Emrê xwe ew cahilê, dî wê da dîke derbaz-e.
Der-dora xwe nabine, jî te ra dani çî saz e,
Govend jî te..


lorin-lawin.. jî dayikê dîxwaze!

De dîlo were bileyze(!)..
de were dîlo tu bileyze(!),

1990/1993 - PARÎS

(*) Ew helbest, jî ali xweyê xwe da
bî mîqam hatne danin.





**Ez ne şair, ez ne hozan,
ez ne xwediye ew dew, dozan.
Ez hemal im, barê xwe xem,
menzil ber bî dîl bî kulan!..**